





Sîrnex


(...)  
Gelek tofan dime, gelek karesat, bobelat  
Û dakeleme li bin heft tebaqe dinê...  
Lê ne bejna xwe tewandî me,  
ne çong veda me,  
Mîna rûspiyekî zarxweş û bi efsûn,  
Pala xwe dame çiyayê nimêje  
Sîr didosim ji memikên roje.

(...)  
Berken Bereh

## Naverok...

Di bîngeha wêjeya devkî de wêjeya zarokan/ <b>Ferîdûn BÎRGUL</b> .....	Rûpel 4-5
Di wêjeya zarokan a Kurdî de reng û dengê jinê/ <b>Roza METÎNA</b> .....	Rûpel 6
Ji Şengê û Pengê heta bi Nûbihara Biçûkan/ <b>Luqman GULDIVÊ</b> .....	Rûpel 7
Di pirtûkên dersê de wêje/ <b>F. Melîk AYKOÇ</b> .....	Rûpel 8-9
Zimanê kuçeyê/ <b>Bawer RÛKEN</b> .....	Rûpel 10
Hevnasîna Hawar û Riya Tezel/ <b>Îbrahîm BULAK</b> .....	Rûpel 11
Şakiro û dengbêjî/ <b>Rahmî BATUR</b> .....	Rûpel 12
'Nameyek ji dayika min re bişînin'/ <b>Şarîstan NURHAQ</b> .....	Rûpel 13
'Delal Can'/ Dizgûnê DEWRÊŞ .....	Rûpel 14
Helbest çî ye?/ <b>Resûl BALTACI</b> .....	Rûpel 15

## Serborî...



**Herausgeber:**

Medya Presse-und Werbeagentur GmbH  
Hans-Böckler-Str. 16  
63263 Neu-Isenburg

**Geschäftsführer:**

İzzet Akcin

**Ver. Redakteur:**

Özgür Reçberlik

politikart@yenlozgurpolitika.org

# Domanu rê van, pîlî biwanê... Sanikî û heqatî domanu ser!

► Eren KILIÇ

**V**axto vireni de zon, û tavi ki zonê ma qesey biyene. Dewunê ma de her çiqas ki millet gegane tirkî kerdenê werte ki, zonê ma wertê rozê de cayê xo qeyim guretenê. Hem butu meseley hemî ke sanikî zonê ma ra amenê ra zonî. Domanî nêyra guretenê barê û xeyalunê xo.

Waxt verdê ra, radonî veciyay. Miletê ma kar û gurê xo ra têpiya qelewiyene verê bonu, gosê xo estenê radonu. O waxt ki radonî butu zonu binu de qesey kerdenê; inglîzki, al-mankî, fransizki û tirkî, hama zonê ma de phizê çinê biyê. Teyna cayê duri ra, Yeriwan ra gegane kurmanci hêşiyenê pê. Hêya tometiya dewletî estê biyê hama kesê ke nêama fiqrê radonê zonê ma. Roştberî, averberî û şoreşkerî butu her çiyê xo kerdê tirkî.

## Domanu rê xet flîmek nêvirajîya

Waxt verdê ra televizyonî veciyay. Miletê ma verê bonu ra şiyê kotê zerê çêwunê xo. Endî çêwunê xo de, verê televizyonê xo de, ebi zonê tirkî teyna mendê. Zonê ma her ki şî tenêna senik qesey biyene. Ma se kerîme; "Köle İzaura", Dallas ra Ceyar, Şîrinu, He-Man ra bicê hata Red Kit. Verê mal de Mem, pê gawu de, wertê cûn de Hes, serê kowu de Şervan, endî sima rê kam kamî bimorî? Olê butu piya tirkî qesey kerdenê. Waxt verdê ra, giran giran radonî û televizyonî kirmanc û kurmanci bi zêdey. Ju ra bi di, di ra bi çor, çor ra bi hêşt, hêşt ra bi hazar. Her televizyonê de şiyaset, veng û vaz, kilamî, kilamî û kilamî estê bi. Hondê re-qeşiyene ki nêama inu vir, di-hire kilamî ke domanu rê bivirazê. Ya ke çî hêf ke domanu rê ne ju xet film ne ki ju "Adile Naşit" estê bi. Çinay rê van Adile Naşit? Belkiya tayinê anê ra xo vir ke, a TRT de satê 20.00 ra aver domanu rê saniku qesey kerdenê, hên ma rusnenê cilê. Şoreşkerê mayê kirmanc û kurmanc hondê waxt ra têpiya çî hêf ki naye hona qe fam nêkerdê.

Kotî de ki zonê ma ra ju kitav biveçiyoy, ez desinde dan ardene. Wertê ninu de xeylê kitavê sanikê domanî estê. Emegê kamî ke werte ni kitavu de esto, wa wes û war bo. Sanikê hênenî estê ki, ti vana "Grimms Birayî" sanikunê ma do are, vetî.

## Çend kitavunê domanu

Ez serrune 96ine ra nat kitavu dan are. Tayê kitavunê domanu ita de sima rê bimorî:

✓ Pasa û Vilika Usarî - Nustox: Efendi Yıldız Nu kitav orijînalê xo ebi tirkî nuşiyoy. Hetê Hawar Tornêcengî ra amo çarnayene û 2001 de Vejîayîşê Tîjî de veciyo.

✓ Dersim Fabllaarî-I - Nustox: Daimi Cengiz, Tirkî û Kirmanckî, 2001 de Kalan Yayınları de veciyo. 30 tene sanikî tede estê.

✓ Biza Kole - Nustox: Vedat Dalokay. Hetê Hawar Tornêcengî ra amo çarnayene û 2000 de Vejîayîşê Tîjî de veciyo. 1973 de reyîsa belediyawa Anqara Vedat Dalokay na hekata Dersimî yê domantiya xo, her daim çêwunê xorê ana zon, ora têpiya ebi tirkî nusnenê.

✓ Welat ra sanikê şani - Nustox: Xal Çelker. 2005 de Vejîayîşê Tîjî de veciyo. Ekê sanikê dergî ke kokimunê ma sondê hata sodir qesey kerdenê, kuna sima vir, o waxt nu kitav desinde bihernê rê biyarê çêwunê xo.

✓ Dêvo Kor - Nustox: Huseyin Ballikaya, Estanikanê Gimgimî ra, 2010 de Veşanxaneyî Vateyî ra veciyo. 8 tene sanikê

• "Nustoxê ke hewes kenê zonê xo de domanu rê saniku û hekatû binusnê, wertê qom û qeyla xo de ca nêvînenê. Tayê persenê; hew zonê ma de alfabe esto? Tayê xo goynenê; vane, ma dewe ma de niya nêvacîno! Tayê vane, hew zonê ma de tiyatroy esto? Ma ez çira bêri tiyatroy, ez xora zonê xo zonen."

dergî û kani tederê.

✓ Filît û Gulizar - Nustox: Seyidxan Kürîj. Hetê Leyla Atak ra amo resm kerdenê. Tam domanu ra gorewo. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ra amo vilakerdene.

✓ Pîre û Luye - Nustox: M. Malmîsanîj. Hetê Ulf Löfgren ra amo resm kerdenê. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ra amo vilakerdene.

✓ Sanikanê Mamekiye ra - Nustox: Nadire Gûntaş Al-datmaz. Weşanxaneyê Roşna de 2016 de veciyo. Tayê sanikanê domantiya sima va bêro sima vir. 2012 de Veşanxaneyî Vateyî ra veciyo.

✓ Şaismayil - Nustox: Ali Beytaş. 14 sanikanê Gimgimî tederê. • Kermo Çimvêşan - Nustox: Alan Dilpak û Lerzan Jandil, ju sanika modernî. Ju kitavê ki lewe de serva boyax kerdenê esto. Domanî hem sanikî buwanê hem boyax bikerê.

✓ Şazadeo Qickek - Hetê Asmeno Bêwayir ra amo çarnayene û serra 2009 de amo çapkerdene. Ebi na kitabi Bêwayir literatürê dîna resno zonê ma.

✓ Alik ve Fatike ra - Nustox: Heyderê Şoşeni. Hetê Mehmet Güneş amo resm kerdenê. Ju sanika de wesa û 2007 de İzmir de veciyo.

✓ Estanekanê Sêwregi ra - Nustox: Feyza Adabeyî. 2005 de Veşanxaneyî Vateyî ra veciyo. 43 teneyî sanikê wesê tederê.

✓ Pitwezîr - Nustox: Hakki Çimen. Hetê Sabine Neupert amo resm kerdenê. 2011 de amo çapkerdene. Ju sanika de zof wesê.

✓ Axaê Niske - Nustox: Hakki Çimen. Hetê Sabine Neupert amo resm kerdenê. 2013 de amo çapkerdene.

✓ Herremusikode qickek wazeno bizono, kam sarê ey sero kerdo? - Almankî ra çarnayenê: Eren Kılıç, 2013 de amo çapkerdene. Ju sanika de namdarê yê almankî çarniyoy zonê ma.

✓ Koramore - Nustox: Eren Kılıç, hetê Hüseyin Işık amo resm kerdenê û 2014 de amo çapkerdene. Nu kitav ebi kirmancî û kurmanckî (hetê Evin Ronî çarniyoy, hetê Luqman Guldivê redakte biyoy)

✓ Yemosa Kokime û Mesela Kartolan - Nustox: Kamer Söylemez: Sanika kê Söylemez ebi xo imis kerdo, hetê Gülşen Sarılı amo resm kerdenê û 2014 de amo çapkerdene. Zonê xo kirmancî û kurmanckîyo.

## 'Her çiyê xo serê zonunê binu de xelesnenê'

Tavi hona dadesê kitavu estê. Hama çî hêf ke, ma ki zonunê binu de qiyas kerîme zof senikê. Kar û gurê ni nustoxu ke hetê kes ra nino vînitene. Onciya çî hêf ki, ni saniku ra zaferî hetê pedegojîya domanu ra nêamê gure-nayene û rast kerdenê. Gegane vilê dêvî danê piro, gegane wa û bira jubin kisenê û domanê 2 serrî ra wananê. Kamcî sanikê kamcî serrî ra gorewo kes kategorize nê-



kerdo. Ju ki kitavî ke vecinê, zofttene bê resmî vecinê. Hama ma bizonime ke domanî ebi resmî tenêna raw nusene. Ez çira nustoxu rê biqariyê kê! Miletê ma çêwunê xo ebi kitabunê şoreşê dîna kerdê pir (hama qe nêwendê) hama zonê xorê refunê xo de ca nêverdê. Kirmanc û kurmanckî ma butu; hardê xo, azadiya xo, xoseriya xo, itiqatê xo û her çiyê xo serê zonunê binu de xelesnenê.

## Sima rê kamcî mesajê rusnenê

Nustoxê ke hewes kenê zonê xo de domanu rê saniku û hekatû binusnê, wertê qom û qeyla xo de ca nêvînenê. Tayê persenê; hew zonê ma de alfabe esto? Tayê xo goynenê; vane, ma dewe ma de niya nêvacîno! Tayê vane, hew zonê ma de tiyatroy esto? Ma ez çira bêri tiyatroy, ez xora zonê xo zonen.

Nika werte honde têwerte de bêrê ke sima domanu rê, yanê uzunê xo rê wayir biveçiyê. Nu çitir beno ke? Hala rey şêrê Google; "çocuk kitabları", "Kinderbücher" ya kê kitabê domanu binusnê. O waxt sima zonenê ez sima rê kamcî mesajê rusnenê.

# Di bingeha wêjeya devkî de



# wêjeya zarokan

► Feridûn BÎRGUL

Di warê perwerdeya zarokan de çîrok û cureyên wêjeya devkî yên din xwedî cihekî girîng in. Li gorî lêkolînên zanistî vegotina çîrokan ji hêla civakibûyîna zarokan ve bandoreke erênî li zarokan dikin.

Zarok ji du-sê saliya xwe û pê ve, êdî dikare guhdariya çîrokan bike. Her çend tam tenegehîjin ji zarokên du-sê salî ji çîrokan hez dikin. Di rastiye de ne tenê çîrok, her wiha tevahiya berhemên folklorîk xwedî çar fonksiyonan in; fonksiyona xweş wext derbaskirinê, şahî û yariyê; fonksiyona piştgirîda-yîn û xurtkirina nîrx û avahiyên civakî û adetên; fonksiyona perwerdeyê û veguhêztina bo nîfşekî din; fonksiyona xwe-jê rizgarkirin û deşarja ji zor û zexta nîrxên civakî. Çîrokan Kurdî gelekî hîndekar û şîretkar in. Di van çîrokan de li dijî begavî, neçarî, tunebûn û xizaniyê, çawa em dibînin imkan û mecalên nedîtî, nebihîstî ji aliyê mîrxasên çîrokî ve tên aşrandin, di nav van berhemana de ew şerê pakî nepakî, qenci-xirabiyê, xweşî-nexweşiyê her diçe tûj dibe, her çiqas dilsar û rûsar be jî, dawîya beşeke wan çîrokan carinan bi mirin-kuştinê diqede. Ew şer-dêw, teqereq, serpehatî, bûyer û qewmînen mezin ên ku di çîrokan Kurdî de tên pêşkêşkirin, ji aliyekî ve jî wek ney-nikekê, jan, serêşî û rewşa civatê nişan didin, peywendî û hevgerîdanên mirovî radixin ber çavan. Di çîrokan Kurdî de gelek dab û efrîr, rêveçûn, karakter, nihêrîn û dîtînen li ser jiyînê hene. Civatê bi rêyêke hunerî, artistîk, bi alikariya zîmanê çîrokan daxwazî, hêvî û xewnerojên xwe yên sedsalan ji nû ve pêşkêş kirine. Civatê bi dirêjahiya salan, bi hezaran çîrok aşrandine, li gorî sal-zemana hewcedariyên me yên hunerî bi çih anîne, em têr kirine. Hunera çîrokbêjiya Kurdî di jiyîna rastîn de nîn be jî, qet nebe jî me re çihaneke çîrokî wek xelat hîştîye, pêşkêş kiriye. Dema em naveroka çîrokbêjiya Kurdî raçav dikin, em dibînin ku gelek babet û motifên ji hev cuda di nav van berhemana de çih girtine. Ev dewlemen-diya motifan nişani me dide ku civat ji her aliyê xwe ve bûye babeta çîrokan.

### Çîrok û hûnandina mijarên civakî

Bi kurtî mirov nikare peyvên çîrok û civatê ji hev cuda bike, biqetîne. Li ser vê bingehê çîrokan ji bo zarokan tên gotin, bi roleke girîng radibin. Ev rewş di hemû cureyên wêjeya devkî de û nemaze jî di çîrok û serpehatî û stranên de heye. Di çîrokan Kurdî de mijar bi piranî çavkaniyên xwe jî bûyerên civakî yên rastî hildigirin. Di hemû platformên vegotîna de ev mijarên civakî tên nîrxandin. Her wiha di warê perwerdeya zarokan de çîrok û cureyên wêjeya devkî yên din xwedî cihekî girîng in. Li gorî lêkolînên zanistî vegotina çîrokan ji hêla civakibûyîna zarokan ve bandoreke erênî li zarokan dike. Zarok bi alikariya çîrokan têkiliya di navbera "xwe" û "kesên din" de têgihîştîr dibe. Çîrok di veguhêziya çandî de, wekî cureyên wêjeya devkî xwedî roleke girîng e.

Zarok di dema pêşdibistanê de an jî dê û bavê xwe an jî mamosteyên xwe guhdarî dike. Bi vî awayî tehma guhdariyê werdigire. Zarok bi rêya guhdarîkirinê di hişê xwe de bûyeran zindî dike û bûyeran fêhm dike. Di zarokan de dema ku li çîrokan guhdarî dikin bi giştî rewşên wiha derdikevin holê. Tiştên ku fêhm dike dikare bi devkî vebêje, dikare xwe bixe dewsa lehengên çîrokê, taybetiyên lehengan ên fizîkî û giyani di nava xwe de his bike û her wiha rewşên din pêk bîne. Pirsên ku derbarê çîrokan de ji zarokan tên pirsîn, bersivên wan ku zarokan didin li gorî nihêrîn û taybetmendiyên zarokan diguherin. Zarok dema ku bersivan didin, di bin bandora bûyeran de an jî çalakiyên jiyana rojane de dimînin û derdor bandorê li ser nêrînen wan dike. Dibe ku hinek pirsan bê bersiv jî bihêlin. Ev rewş mihtemelen bi têgihîştin û pêşveçûna zîmanî, zanîni, hestiyarî û civakî ya zarokan ve girêdayî ye.

### Wêjeya zarokan ji bo zîman girîng e

Hinbûyîna zîman di malbatê de dest pê dike û tevahiya jiyânê didome. Ji bo pêşveçûna zî-

man rola çîrok, helbest û hwd. girîng e. Pirtûkên ku bi perwerdeya zîmanî hûrgilî û rê û rêbazên zîman hîni zarokan dikin, di heman demê de peyvdankên zarokan zêdetir dikin. Di pirtûkên zarokan de, hevokaziyên bi rêkûpêk, perwerdeya fikirinê, hilberîna fikran, naskirina cureyên mirovan û çareserkirina pirsgerêkan bi pêş dixin û destketiyên di hewînî. Zarok bi rêya pirtûkan, bûyeran di hişê xwe de zindî dike, wan dipêve, li gorî fikr û nihêrîna xwe şîrovevan dike.

### Wêjeya devkî ji bo zarokan didaktîk e

Di civakê de vegotina wêjeya devkî ya ji bo zarokan bi giştî bo dem derbaskirin, ewiqandin an jî şakirîna zarokan tê dîtin. Ev yek, cara ewil di malbatê de xwe nişan dide. Lê dema ku em li ser bandora wêjeya devkî ya li ser zarokan rawestînin, hingê dê hêla wê ya perwerdekarîyê eşkere bibe. Zarok dema ku bi cureyên wêjeyê re rû bi rû dimînin, gelek pêşketinên erênî derdikevin holê. Di zarokan de hêza xeyalan zêde dibe û afirînêriya zarokan bi pêş dikeve, bi vî awayî jî jiyânê, siruştê û derdora xwe watedartir dibînin. Di vê minakê de jî diyar e ku zarok di jiyana xwe de bi awayekî afirînêr û çalak wêjeyê bi kar tînin. Di wêjeya devkî ya zarokan de bi rêya jixweberiyê tiştên balkêş derdikevin holê. Kesên ku me di çarçoveya berhevkirina çîrokan de bi wan re hevdiyan pêk anî, diyar dikirin ku berê zarokan di navbera xwe de, derbarê rewşa jiyana civakî, siruşt û ajelan de tiştên bi rîtm digotin. Minak ji herêma Serhedê di navbera du-sê zarokan de, derbarê tav û sihê de zûgotinokêke wiha di-hate gotin. Lê bi armanca ku hewa hinekî hênik bibe an jî ku germ bibe li gorî rewşê di-hate guhertin, ji tav û sihê re wiha digotin:

"Tavê here kurê te bieci  
Sihê were qîza te bieci  
Tavê here kurê te bieci  
Sihê were qîza te bieci"

Zarok di vê zûgotinokê de, li cihê li derve ne. Çavkaniya wan ji bo vê zûgotinokê jiyana rojane ye. Rol-modela yekem ji bo zarokan dayîk e. Dema ku zarokên biçûk digirin dayîkên wan bi lezûbez, li wan xwedî derdikevin û bi wan re laqedar dibin. Zarokên ku çavdêriya vê dikin di vê zûgotinokê de dixwazin, listikekê binin serê tav û sihê.

Bo dîtina sudeya wêjeya zarokan ku di perwerdeyê de çawa bandorê li zarokan dike, divê di pêvajoya perwerdeyê de li ser tevger, fikr, nihêrîn û nirxandinên zarokan mirov hûr bibe. Ew revş girîngiya çawanîya wêjeya zarokan derdixe holê. Amadekirin û pêşkêşkirina wêjeya zarokan rola herî sereke digire. Pirtûkên ne li gorî temen, hişmendî û taybetiyên zarokan bin, yan jî ne li gorî nixên civakê bin, dibe ku ew pirtûk li ser pêşveçûna zarokan bandorên nerênî bikin. Li gorî pêzandinên akademîk, armanc, girîngî û taybetiyên wêjeya zarokan wiha dikarin bîr rêzkirin:

#### Armanca Wêjeya Zarokan

- Agahdar dike
- Kêfxweş dike
- Jiyane bi zarokan dide nasîn
- Hêsta bixwebaweriyê bi pêş dixe
- Xwesteka serketinê hişyar dike
- Ji bo mirov û derdoran hişmendiyê derdixe pêş
- Civaqibûna zarokan bi pêş dikeve
- Pêwendiyên zarokan ên estetîkî û rindî dibîne
- Pêşketina ziman xurt dike
- Pêşketina zihni xurt dike
- Xeyalên zarokan berfireh dike û afirênêriya wan bi pêş dixe
- Di pêşveçûna kesayetiyê de bandoreke erênî dike
- Pirtûkê dide hezkirin û watedarkirin
- Di pêşdibistanê de xwendina dîtbarî bi pêş dixe

#### Taybetiya Wêjeya Zarokan

Berhemeke wêjeya zarokan bi giştî divê xwedî hin taybetiyên bingehî be. Ew divê;

- Hindekar be
- Li gorî asta zarokan a hestiyarî û zanîni be
- Bala zarokan bikişîne
- Zarokan ber bi lêkolîn û lêhûrbûyîni ve daf de
  - Li cem zarokan hest û ferasetê bi pêş bixe
    - Çand û nixên civakê bi zarokan bide nasîkirin
    - Ji tecrûbeyên mezinan sude bide girtin

#### Sendroma Peter Pan û Wêjeya Zarokan

Li gorî pêzandinên li jor hatine ravekirin diyar e ku wêjeya zarokan bo zarokan ji hêla mezinan ve tê çekirin. Agahiyên derbarê vê mijarê de di lêkolîneke me ya bihûrî de wiha hatibûn ravekirin. Jacqueline Rose, di berhema xwe ya bi navê Sendroma Peter Pan de, derbarê wêjeya zarokan de wiha dibêje: "Wêjeya zarokan ne pêkan e, ji ber ku ji hêla mezinan ve ji bo zarokan tê aşrandin û di heman demê de tişteki sexte ye." Li ser vê bingehê wêjeya ku ji hêla mezinan ve tê çekirin heye û navê wêjeya zarokan lê tê kirin. Li gorî hin kesên din; "ji bo zarokan wêjeyekê cuda nabe" ji ber ku kêfa mezinan jî tê ji hin pirtûkên ku ji bo zarokan hatine nivîsîn.

Li ser vê mijarê Inci Enginun dibêje, "Ji bo zarokan wêjeyekê serbixwe ne pêwîst e, ji bo zarokan berhemeke hunerî li gorî hişmendiyê wan bê pêşkêşkirin zarok dê ji wê berheme kêfê wergirin" Bi tevî girîngiya amadekirina wêjeya zarokan a nivîskî, bi gotina lêkolînerê Fransî Paul Dumont jî bo wêjeya zarokan "Çekek e gelo?" girîngiya wê bêhtir derdikeve pêş. Bi qasî amadekirina cureyên wêjeya zarokan, lîdarxistina wan jî girîng e. Zarokên niha di heman demê de nişên dahatûyê ne, ew "çek" a Dumont behsa wê kiriyê, çawa bê sazîkirinê de wisa bandorê li ser nişên dahatûyê jî bike.

#### Zarokên pêşdibistanê jî dimenan dixwînin

Girîngiya wêjeya zarokan bi taybetiyên pirtûkan ve girêdayî ye. Pirtûkên ji bo zarokan tên amadekirin berî ku di perwerdeyê de bîr bikaranîn divê li gorî taybetiyên zarokan û bi rê û rêbazên materyalên perwerdeyê bîr nixandin. Di wêjeya zarokan de pirtûkên ku rasterast digihêjin ber destê zarokan pirtûkên çirokan in. Di dema pêşdibistanê de her çîqas zarok pirtûkan bi awayê nivîskî nexwînin jî, ji aliyê mamoste û malbatan ve jî bo wan tên xwendin, lê belê zarok jî bi dimen-wêneyan pirtûkan dixwînin. Derbarê taybetiyên pirtûkên pêşdibistanê de hin agahî wiha ne:

- Di dema pêşdibistanê de ji bo ku bala zarokan li ser pêlîstokan bidin alî, divê pirtûk ji hêla huner û estetîkê ve têr û tije bin û bala zarokan bikişînin. Divê di nivîsan de şaşitiyên rêzimanî û peyvên argoyî tunebin.
- Pêwîst e, bi zîmanekî zelal û fêmbar bîr amadekirin.
- Ji hêla grafîkê ve divê pirtûk bi pisporî bîr amadekirin, wêneyên pirtûkan çîqas xwerî, vekirî û nezi rasteqîniyê bin, ew qas dê jê sûd bê wergirtin.
- Di pirtûkan de ji hêla teşeyî ve, bi taybetî ji hêla wêneyan ve huner gelekî girîng e.

Wêne çîqasî bi hunerî hatibin xêzkirin, pirtûk ew qasî nezi zarokan dibin.

● Di pirtûkên pêşdibistanê de ji hêla zarokan ve wêne ji mijara çirokê girîngtir tên dîtin. Li ser vî esasî, wêne bi tena serê xwe dikarin bandoreke mezin li zarokan bikin.

● Di pirtûkên zarokan de bûyerên bi tirs, şer, tohlilanin bandoreke nerênî li ser derûniya zarokan dikin. Zarok di nava xwe de ji nû ve şahidiyê dike li mijarên bi vî rengî û dîre di jiyana xwe ya rojane de, bi hevalên xwe û malbata xwe re bi kar tîne. Derbarê vê mijarê de UNESCO, bo sererastkirina perwerdeya mafên mirovan biryaran digire. Li gorî "Biryarên Pêşniyazî yên bo Perwerde û Maf û Azadiyên Bingehîn ên Mirovan" "Divê ifadeyên dijminahî, êrîşkarî û çihêti jî pirtûkan bîr derxistin." (Konferansa Giştî a UNESCO-1974). Li ser vî esasî, pisporên meydana pêşdibistanê yên cihanê ve biryarê dipejirînin û li herkesî pêşniyaz dikin.

#### Çavkani

- Birgul, F. (2015). *CUREYÊN WÊJÛYA DEVKÎ YA KURDISTANÊ. F. BİRGUL, Dengê Bakur (r. 47-58). Amed: ENSTİTUYA DI-YARBEKİRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ (DİSA).*
- Dağlıoğlu, H. E., & Çakma, Ö. Ç. (2009). *Okul Öncesi Çocuklarına Yönelik Yayınlanan Hikâye Kitaplarının Şiddet ve Korku Öğeleri Açısından İncelenmesi. T. Kütüphaneciliği, 510-534.*
- Dayioğlu, G. (2000). *Çocuk Kitaplarında Eğitsellik. 1. Ulusal Çocuk Kitapları Sempozyumu Sorunlar ve Çözüm Yolları. Ankara: Ankara Üniversitesi Basımevi.*
- Gurel, Z. (1998). *Çocuk Edebiyatı Kavramı. Kervan Dergisi, s. 4-5.*
- Karatay, H. (2007). *Dil Edinimi ve Değer Öğretimi Sürecinde Masalın Önemi ve İşlevi. Eğitim Bilimleri Dergisi, 465-474.*

Zarok di dema pêşdibistanê de an jî dê û bavê xwe an jî mamosteyên xwe guhdarî dike. Bi vî awayî tehma guhdariyê werdigire. Zarok bi rêya guhdarîkirinê di hişê xwe de bûyeran zindî dike û bûyeran fêm dike.



# Di wêjeya zarokan a Kurdî de reng û dengê jinê



**W**êjeya Kurdan gelekî dewlemend û serbixwe ye. Va rastiya bi gotinên gelek mirovên navdar hatiye dubare kirin. Ji vana yek jê rojhilatnasê navdar Minorsky ye. Minorsky dibêje: "Kurd xwedî wêjeyek gelek dewlemend e, gelek çîrok, destan û stranên wan hene. Ji ber ku wêjeya Kurdan gelek dewlemend e, vê yekê bandor li ser felsefê û şaristaniyê jî kiriye. Felsefê, wêjê û şaristani hevdu xwedî dikin." Her wiha Eli Şeraîti jî bi vê yekê têkildar wisa dibêje: "Yê ku şaristanî û felsefê hîni Yewnana kiriye Kurd e, Kurdê di navbera Dicle û Feratê de ne. Yewnana jî ev felsefê û şaristanî li cihanê belav kirine." Lê hewce ye ku ev tişt jî neyê jibirkirin. Di bingeha dewlemendiya şaristaniyê felsefê û wêjeyê de afirandin û hestên jinê jî hene. Dema ku îro em li dirokê dinêrin, ya ku şaristanî, felsefê û wêjê di tûrikê dilê xwe de bi kedekê giranbiha mezin kiriyê jin in. Mezra Botan di dirokê de qada xwedawenda ye. Her wiha cihê ya niha têkoşinek lê tê darxistin ango "Minbic" cihê xwedawenda bereketê Atargatîs e. Û Atargatîs li ser wêjê, şaristanî û felsefeyek xurt şax vedaye.

## Bi saya wêjeya jinê, zimanê xwe hîn dibin

Jin xweza, jiyân û azadî ye. Di wêjeya jinê ya devkî de "Lori" xwedî roleke sereke ye. Ji bo ku jin pitikê xwe di xew kin an jî derd û kulê dilê xwe bi zarokên xwe re parve bikin Loriya dibêjin. Zarok cara yekem bi Loriyê dayikê xwe zimanê xwe nas dikin. Ango di hînbûn û hînkirina zimên de armanca Loriyan girîng e. Tiştê ku bingeha wêjeya zarokan xurt û dewlemend dike, zimanê dayikê ye. Û zarok bi saya wêjeya jinê, zimanê xwe hîn dibin. Esasê wêjeya zaroka jî li ser zimanê dayikê ava dibe. Ango wêjeya zarokan di bin siwana Loriyê dayikan de bi teşe dibe. Ji bo amadekariya jiyaneke rasteqîn, ji bo zarok xwezaya zimanê xwe fam bikin û ziman li ser koka xwe şin were, hewce ye ku têkiliyek xurt di nav zarok û dayikê de hebe. Zarokên ku jî hest û dilê dayika xwe dîr bikevin ew ê jî rastiya zimanê xwe jî dîr bikevin. Her wiha Amin Maalouf: "Terorîzma herî mezin ew e ku têkiliya navbera gelekî û zimanê wî qut bibe. Bi rastî jî dema têkiliya navbera zarokê û ziman qut bibe dê çand, huner û dirok jî têk biçe. Loma di wêjeya zarokan de reng û dengê jinê girîng in."

## Dengbêjiyê jî hestê jinê feyz girtiye

Di çand û wêjeya Kurdan ya devkî de dengbêji xwedî roleke sereke ye.

Çand û wêjeya Kurdan ya devkî di rastiya dengbêjiyê de tê zanîn. Li gelek platforma destan û çîrokên cûr bi cûr bi dev û dengê dengbêja hatine rave kirin. Loriyên ku bi dil û kedera jinê hatiye meyardin gelek jê bûne mijarên dengbêjiyê. Loma em dikarin di vir de bibêjin dengbêjiyê jî jî hestê jinê feyz girtiye û jî bo li xwedîderketina wêjeya zarokan esasekî xurt û girîng e. Her wiha bi vê xwedîderketinê pêşiya pişafitîne jî tê girtin. Zimanekî ku zarok neaxive, wêjeyekî ku zarok jê bêpar bimine ew ê bi ber tunebûnê ve biçin. Ji bo civakek



Roza METINA

ji xweza û rastiya xwe dîr nekeve, hewceye ku wêjeya wê li ser bingehê xurt bê ava kirin. Heger bi vî awayî nebe wekî nivîskarê nemir Mûsa Anter negot, em ê şêst salên din jî di nav vî agirî de bişewitin û rewşa me yê bibe wekî rewşa Reşo. Nivîskarê nemir Mûsa Anter di pirtûka xwe ya "Çinara min" de behsa bûyerekê dike û wisa dibêje:

"Gundiyekek hebû ye navê wî jî Reşo bûye. Rojêkê kurikekî Reşo çêbûye. Herkesî gotiye:

- Çavên te ronî bin.

Reşo jî gotiye:

- Na bila çavên axê ronî bin.

Gundî şaş û mat dimînin û dipirsin

- Ji bo çî?

Reşo dibêje:

- Çimkî min xulamek jî axê re aniye.

Mûsa Anter jî dibêje:

"Rewşa me Kurdan jî wekî ya Reşo ye. Em bi salan dixebitin lê herî dawiyê tiştê di destên me de namîne. Binêrin bi helbestkarê mezin Cegerxwîn dibêje çî:

"Welatê met ev ziv û zêr e lê em çî bikin maye jî xelkê re."

## Zarok, ziman û wêjê bibin yek dilek

Ji bo ked û xebata me binax nebe û jî xelkê re nemîne, berxwedana civakî û xwedîderketina wêjeya zarokan esas e. Çimkî zarok hêvî û ronahiya pêşeroja jiyaneke ye. Di vî jiyânê de jî bo ziman û wêjê wekî stêrkekê biçiruse û li ezmana bibe wekî stargeheke rewan hewceye ku zarok, ziman û wêjê bibin yek dilek. Dema ku xwedîderketinek bi vî awayî hebe, li ser vî dilê yekê dê hest û xeyalên pîroz bîrên afirandin. Lê dema ku berovajî van tiştana hinek bûyer pêk bê wê demê dê hêlîna ku awazên serxwebûna ziman û wêjeyê tê de dîtayisîn mixabin ew ê bê hilweşandin. Ji bo em nebêjin "Sal bi sal xwezî bi par" hewceye ku em devê delingê xwe bijîdînin û di rêya xwedîderketina wêjeya zarokan û hestên jinê de bi kêferatek jî dil bixebitin. Çimkî xebata di rêya parastina ziman û wêjeyê de mirovan qenc û pak dike. Mirovan bi bask dike û li asîmana gewhereke jî dil li ser rûyê serxwebûnê dibarîne. Her wiha hestên azadiyê jî bi vî awayî tê parastin.

Di şerê navxweyî yê Îspanyayê de Federîko berî ku nijadperest wî gulebaran bikin helbestekê dixwîne û wisa dibêje:

"Mirovên ku ne azad bin çî ne?

Ka bêje Mariana de ka bêje

Heger ez ne azad bim

Ez ê cawa ji te hez bikim

Ez ê çawa vi dilê xwe

Ji bo te vekim ?"

Federîko bi vî helbesta xwe hestê azadiyê di-parêze. Ji bo parastina hestên azadiyê, xwedîderketina wêjeya zarokan û rengê jinê jî hewce ye.

# Ji Şengê û Pengê heta bi Nûbihara Biçûkan

Mirov rahêje Nûbihara Biçûkan, wê weke ferhengeke Erebi-Kurdî binirxîne, yan jî weke ferhengekê ku dixwaze Erebi fêrî zarokên Kurdîaxêv bike, bibîne, ev ê kêmbê. Ji vê û wê de ev ê şaş jî be.

Wêjeya ji bo zarokan yan jî wêjeya zarokan ne mijûliyeke nû vedîtî ye. Ew ne bi Jules Verne û berhemên wî yê klasîk destpê dîke, ne jî bi pirtûkên dersê yê ji bo zarokan amadekirî, tevî helbest û çirokên ji bo zarokan. Berevajî, îro li ber destê me bi hezaran berhem mane ku koka wan heta bi destpêka şaristanyên serdemên kevin dihere. Çirokên gelan, qîsmekî mezin ji bo zarokan hatine sêwirandin.

Lê belê ev berhemên afirîneriya devkî hemû ne bi heman armancê hatine afirandin. Pareke mezin a van berhemên û cureyên wan ên taybet didaktîk in; armanca wan ew e ku hin tiştan fêrî zarokan bikin. Ev fêrî kirin bi rêya vegotina edebî ya tecrûbeyên bi rastî yan jî tesewîrkirî ye. Mirov jî Kurdîyê mînakêkê bide, ya herî pêşî were bira mirovan wê bibe Şengê û Pengê. Şengê û Pengê du karîk in ku dayika wan diçe zozanan û bi tena serê xwe li malê dimînin; ji ber vê yekê tevahiya çirokê weke şîretêkê hatiye sêwirandin û li gorî vê yekê jî temayên weke "biya mezinan kirin", "bi xerîban nexapin", "baldar û haydarbûna li hember tehlûkeyan", "hewîna di stara malê" de derdikevin pêş ku bi cezakirina gurê xirab û rizgarkirina karîkên bêgûneh bi dawî dibe. Di nava çirokê de bi rengê niv-



Luqman GULDIVÊ

me bi cureyekî edebî xwe fêrî zîmanekî dikir. Ha ev terz berê jî hebû, angû ne vedîtina seydayê mezin ê Kurmanciyê Ehmedê Xanî ye.

Ev terza fêrkirina bi rêya jiberkirinê, di nava mîletên rojhilata navîn de kevin e û jî ferhengên Erebi-Erebî yê zîmanî heta bi yê Osmanî-Farsî-Erebî yê pîrîzmanî di nava xwe de dihevine. Ji bo jiberkirinê hêsan bike amûra sereke ya hatî bikaranîn kafiye û wezn in. Ango nivîsa menzûm weke amûreke fêrkirîna ya sistematîk hatiye sêwirandin. Ya balkêş ew e ku ev rêbaz û ev terz ne bi tenê ji bo zarokan belê jî bo mezinan jî hatiye ceribandin.

### Di rêuresma ferhenga menzûm de Xanî

Bi qasî mirov dikare di nava nivîsê de li minakên wê bigere, xwediyê yekem ferhenga bi vî rengî ya Reşîduddîn Vatvat ê İrânî ye ku sala 1182'yan wefat kirîye\*. İbn Mu'tî yê sala 1231'ê wefat kirî jî ferhengên Erebi-Erebî bi rengêkî menzûm jî nû ve nivîsîne. Di dema Osmanîyan de jî çend ferhengên bi vî rengî hene ku balkêş e ji bo fêrkirina zarokan hatine nivîsandin û sêwirandin. Ji bo mirov li ber hev bigire, mirov dikare behsa Luğat-i Ferîşteoğlu bike ku sala 1392'yan hatiye



menzûm du beş jî hatine bicihkirin ku qîmetê wêjeyî bêhtir lê bar dîke.

Herçî nivîs e, wêjeya ji bo zarokan xwedî dîrok û rabihuriyeke din e ku ez ê pê danekevim, lê ez ê behsa destpêka wê ya di perwerdeya li medreseyên Kurdî de bikim. Nûbihara (Nêbihara/Nûbara) Biçûkan, bi ya min di vî warî de weke gaveke girîng a yekem dikare were nixrandin. Ango mirov rahêje Nûbihara Biçûkan, wê weke ferhengeke Erebi-Kurdî binirxîne, yan jî weke ferhengekê ku dixwaze Erebi fêrî zarokên Kurdîaxêv bike, bibîne, ev ê kêmbê. Ji vê û wê de ev ê şaş jî be.

Lewma, ev berhema ku nivîskarê wê Ehmedê Xanî ji bo wê dibêje, "Ne jî bo sahib rewacan, belkî jî bo biçûkê Kurmancan" jî rêuresmeke kevin a ferhengçêkirinê tê ku bi hêza helbestê zîman fêrî mirovan dîke. Dibe ku li bira hinan jî me mabe, dema me di zarokatiya xwe de digot, "eşek' ker e, 'sarî' zer e" û bi vî rengî jî xwe re li hev dianî. Me ne tenê jî xwe re li hev dianî,


nivîsandin û li medreseyên Osmanî weke kitêba dersê dihat xwendin. Di wir de Ferîşteoğlu jî bo armanca nivîsandinê wê ferhenga menzûm a du zîmanî dibêje "Oğlim oğli Abdurrahman luğat okumağa yaklaşti, ben de anâ yâdigâr bir risale nezim itdum."\*\*

Xanî jî weke Ferîşteoğlu jî bo biçûkan nivîsiye, bi wê ferqê ku wî ne jî bo zarokên xwe, lê ji bo "biçûkên" Kurdan bi giştî nivîsiye:

*Vêk êxistin Ehmedê Xanî  
Navê Nûbihara Biçûkan danî  
Ne jî bo sahib rewacan  
Belkî jî bo biçûkê Kurmancan.*

### Helbest e Nûbihar

Xanî di Nûbihara Biçûkan de ku jî 12 beşên ferhengî (2-13), beşeke destpêkê û beşa yekê ku hîna derbasî beşa ferhengê nebûye tê pê, hunera xwe ya nezmê bi awayekî jêhatî nîşan daye. Wî terza mesnewî, angû qa-



fiyeya malikan a weke aa, bb, cc, ... (di beşa destpêkê û beşa yekê de), terza xezal, angû qafiyeya aa, ba, ca, ... (di beşên ferhengî de bi kar anîye, ne di beşa dawî de) bi kar anîne. Xanî di heman demê de wezna arûz jî di 13 beşan de bi kar tîne ku herî zêde jî em weznên rezez (beş 2,4,5,10), hecez (beş 1,9,12) û remel (beş 3,7) li cem dibînin. Qafiyeya Xanî jî ji ya dewlemend hefta a pîrr bêje diguhere:

*Da bi van çend reşbelean  
Li wan tebi'et melean* (qafiyeya dewlemend)

*Muellim bila dil wekî ber bitin  
Divêtin ku şagird dilber bitin* (Qafiyeya pîrr bêje)

### Perspektîfa pedagojîk a Nûbihara Biçûkan

Bi her hali Ehmedê Xanî ev berhema wêjeyî jî bo zarokan bi perspektîfeke pedagojîk nivîsandiye. Jixwe dema em berê xwe didin naverokê, rêbaza wî û sinifandina komên peyvan ên ku dixwaze wan fêr bike, em eşkere tê digihêjin ku berhem ne hema jixwerê-lêhato hatiye nivîsandin, lê belê weke kitêbeke cidî ya perwerdeya sistematîk angû ya medreseyan lê hatiye hizirîn û bi wî rengî jî teşe girtiye. Ango perspektîfa pedagojîk beloq e: teknîk û rêbazên "ji nêzik ber bi dûr ve", "ji hêsan ber bi zehmet ve", "ji ya tê zanîn ber bi ya nayê zanîn ve" jî bo fêrkirina mijarên malbat û ferdên malbatê, fizyonomiya mirovî, flora, faûna, hejmar, rewşa hewayê, demsal, çek û amûr, maden, cilûberg, ontolojiya xwezayê û peyvên sereke yê cînsî bi awayekî hostane hatine bikaranîn. Minakeke jî terzê ferhengê wê jî hezar gotinî bêhtir bi kar bê:

*Zivistan şta ye û havîn e seyf  
Behar e rebî' û payîz e xureyf*


### Wêjeya devkî weke pêllîkekê

Weke encam em dibînin ku ev terzê xwe dispêre fêrkirina bi rêya helbestê bi rengê jiberkirinê, cureyekî wêjeyî ye û şik û guman têde nîne ku Xanî bi vî xwestiyê wêjeyê weke amûreke fêrkirîna bi kar bîne. Ev terz di nava civata Kurdîaxêv de devkî jî hebûye û muhtemel e ku terzê nivîskî tesîr li yê devkî kiribe, tevî ku berevajiyê vî jî mumkin e. Wêjeya devkî ya Kurdî di warê çirokên didaktîk ên ji bo zarokan de xurt e û repertuara wê yek jî yê dewlemendtirîn ên dinyayê ye. Ev dewlemendiya wêjeya devkî ya ji bo zarokan dikare bi adaptasyonên zîmanî û pedagojîk jî bo dewlemendkirina wêjeya ji bo zarokan a bi Kurdî bi rola pêllîkekê rabe da ku wê bigihîne qonaxên sêwirandinên ferdî yê wêjeyî jî bo zarokan.

\* Bînihêre li Kadri Yildirim. Ahmedê Xanî Külliyyat: Nûbihara Biçûkan, Weşanên Avesta, Stenbol 2008. r. 117.

\* Kurê kurê min Ebdurrahman gihîşt emrê xwendina zîmanî. Min jî ji bo wî nameyêke menzûm nivîsi. (Bînihêre li çavkaniya li jor, r. 122)

# Di pirtûkên dersê de wêje



Perwerde; çalakiyê keşan di warê bir, giyan û bedenî de xurtkirin, di kesayeti-yekê bijûn bîdestxistinê de alîkarîkirin, li gor hermanên zanarî heredarî û têgihîştinêke ji bo siberojêke serkeftî dayînê ye. Perwerde ji bo zarok bikane xwe, civaka xwe, cudahiyan xwe û kesan, dirok û demên borî û ayendeyê civaka xwe baş binase, pêvajoyekê vekîşin û amadekariyê ye. Zarokê ku dest bi perwerdê kiriye, bi awayekî xwezayî dikeve nava prosesa xwe û civaka xwe naskirinê.

Perwerde di nava malbatê de destpêdike, mirov li gor pêdiviyên jiyandê tînan amadekirin. Wekî minak civaka jiyana wan li ser berevîkirin û neçîrê bûn, zarokên xwe li gor wê amadedikirin, dikin. Metnên wan devkî ne û çirokên wan yê neçîrê bûn û hê ji wisa ne. Yê cotkarî û sewalvaniyê ji bêguman li ser jiyana wan bûn.

Di nava civaka me de herî zêde pêvajoya sewalvanî û koçeriyê dirêj kudandiyê. Lewma di nava çirok û vegotinên me de mijara bêrî, bêrîvan û şivên gelek zêde û bi awa awayî hatiye neqîşandin. Minak "Siyabend û Xecê, Cembeliyê Hekarî" û hê gelek çirokên me yê netewî yê din li ser vî mijarê ne. Dîsa di nava stranên me de ji mijarên stranên herî zêde li ser şivan û bêrîvanê ne. Minak strana "Bêrîvanê, Lo Şivano".

**Dirokêyêke sedsalî ya perwerdeyê li Kurdistanê**  
Padişahê Dewleta Osmanî Sultan Abdulhamîd ji bo piştigirîya eşîran bigire, di encama xebatê de bi navê "Aşîret Mektebî" li Stenbol û Bexdayê du dibistanên bi Kurdî û Osmanî ders didin, vedike. Bi giranî zarokên serokeşîr, mîr û began di van dibistanan de dicivîna û li gor bîrdoya xwe perwerde dike. Lê ji ber ku dersên Kurdî û nîrxên eşîrî ji hebûn, di warê çîna de ji be, neziyatîyêke civakê ji hebû.

Di sala 1900'î de bi navê "Kürt Teavvün ve Terakkî Cemiyetî" (Civata Alikarî û Pêşxistinê ya Kurdî) cemiyetêke tê damezirandin. Ev civat li ser rêya "Divan-yolu" ya Stenbolê di bin rêveberîya Abdurrahman Bedirxan de bi navê "Dibistana Meşrûtiyê" dibistanekê Kurdî vedike. Di destpêkê de 30 xwendekar diçin û dibistanê, lê dû re dibistan tê girtin.

### Li Başûrê Kurdistan

Civata Netewan di sala 1925'an de statuya Başûrê Kurdistanê nas kiribû. Ji ber vî sedemê ji Ingilîzên wê demê serwerê Iraqê, destûra vekirina dibistanan dabû Kurdan. Kurdên başûr sala 1926'an civata çandî "Cemiyetî Zanistî Kurd" vekirin. Vî civatê li gel vekirina dibistanan, nivîsandin û amadekirina pirtûkên dersê, vekirina pirtûkxaneyan û xwendekaran ji bo perwerdê şandina welatên din, ji xwe re wek armanç hilbijartibû. Di sala 1930'î de bi tevî du dibistanên navîn 60 dibistan vekiribûn. Di van dibistanan de 1411 xwendekaran ders didin.

Lê ders di hefteyê de tenê 13 saet bi Kurdî bûn. Sala 1944'an di navbera serkariya Iraq û hêzên Kurd de peymana xweseriyê hate imzakirin. Bi vî ji Kurdistan di warê perwerde û ziman de gihîşt xweserîya xwe. Li Zanîngeha Bexdayê beşa Kurdî ji hate vekirin. Alaaddin Secadî ji sala 1960'î hetanê 1984'an li ser vî kursiyê bû.

### Perwerde li heremên azad

Li Başûrê bê vî derfeta fermî li deverên ku hatibûn azadkirin ji dersên Kurdî dihatin dayîn. Ji bo vî berê kesên dikebin mamostetî bikirana hatin perwerdekirin. Van mamosteyan ji dersê dida, wek minak: Li devera Gîlala Xwendegehêke Amadeyî (lîse) du dibistanên navîn (Xwendegeha navendî) û gelek dibistanên seretayî hebûn.



F. Melik AYKOÇ

Komiteya şoreşa Iraqê di 4'ê Tebaxa 1968'an de bi biryarêkê li her derê dibistanên Kurdî vekirin. Li Silêmaniyê ji Akademiya Zimanê Kurdî hate vekirin û Ibrahîm Ehmed ji wek Rêktorê wê Akademiyê hat tayînirin.

### Li Rohhilatê Kurdistanê perwerde

Di salên 1912-13'an de bi rêberîya Simko û Abdurrezak Bedirxan li bajarê Xoy bi navê "Gihandin" civateke çandî hate damezirandin. Ji armançên wê civatê yê bîngêhîn yek ji vekirina bi zimanê Kurdî dibistanên perwerdeyî bû. Her çendî Şahînsahiya Îranê ket pêşira wan jî, wan bi navê "Dibistana Destpêkî ya Kişt û Kal" dibistanekê pişeyî vekir. Wê demê wan di warê alavên teknîkî de ji Rûsya û Fransayê ji alîkarî girtibû. Li vî dibistanê dersên dirok, erdnîgarî û matematîkê ji hebûn. Hê di destpêkê de hêjmara xwendekarên dibistanê gihîştibû 29 kesan.

Komara Kurdistanê ya navenda wê Mahabad, di çileyê 1946'an de hat damezrandin. Bi awayekî xwezayî zimanê fermî li perwerdeyê Kurdî bû. Wezîrê perwerdê Manaf Kerîmî li aliyekî dibistan didan vekirin, li aliyekî jî ji bo ku bikane bersiva perwerdê bide 600 xwendekar şandin Sovyetê. Di wê demê de bi navê "Girugali Mindalan" kovareke zarokan ji hate derxistin. Nivîskarê nemir Rehîmê Gazî jî wê demê romana xwe ya bi navê "Pêşmêrge" nivîsî. Lê piştî 11 mehên, bi hilweşandina komarê re perwerde ji rawestiya. Bi binketina Şah Rîza Pehlewî re Kurdan dîsa bi derfetên xwe dibistanên Kurdî vekirin.

### Li Sovyetê perwerdeya Kurdî

Hewlîdanên perwerdeya bi Kurdî di dema Çarên Rûs de dest pê kir. Cara yekem sala 1914'an di rêveberîya rêzdar Îosîf Abgarîbî Orbêlî de li zanîngeha Petersbûrgê kursa zimanê Kurdî hate vekirin. Wî sût wergirtibû ji belgêyên Aleksander Jaba yê

salên 1848-1866'an li Erzurûmê Mele Mehmûdê Bazidî dabûn wî û li ser wê bîngêhî ferhenga Kurdî-Fransî amade kiribû.

Demê Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst hate damezrandin, Sovyetê mafê perwerdeya bi zimanê Kurdî jî nas kir. Li hin zanîngehan beşên ziman û wêjeya Kurdî

hate vekirin. Sala 1925'an li Erîvan xwerû li Elegezê dibistanên seretayî û navîn yê bi giranî ders bi Kurdî didan, hatin vekirin. Di vî demê de gelek pirtûkên dersê bi alfabeya Kirîlî hatin amadekirin. Di van pirtûkên dersê de li gel ên Sovyet û Ermenî yê metnên wêjeya Kurdî û yê kesên ev pirtûkên dersê amadekirî jî hebûn.

Li Sovyetê cara yekem 09.07.1934'an li Erîvanê kongreya Kurdolojiyê hat li darxistin. Di vî kongreyê de biryarên wek pêşxistina zimanê wêjeyî (Kurdî), rastnivîs û pêşxistina alfabeya Kurdî, ji nû ve amadekirina rêzîmana Kurdî, ferhengên Kurdî, Kurdî û zimanên din hate dayîn. Her çend sala 1938'an dibistanên Kurdî hatin girtin jî li Ermenîstanê di bin navê ziman û wêjeya Kurdî de li dibistanên Ermenî dersa Kurdî dewam kir.

### Kurdîstana Sor

Sala 1923'an di navbera Ermenîstan û Qarabaxê de bi navê Kurdistanê Sor devereke niv-xweser a bi ser Azerbaycanê hate damezrandin. Li vir ji perwerdeya Kurdî destpê kiribû. Lê Partiya Komunist a Azerbaycanê sala 1926 ev niv-xweserî jî destê Kurdan girt. Piraniya Kurdên Kurdistanê Sor bi fesa-dîya Partiya Komunist ya Azerbaycanê di dema Stalinê de hatin derbiderkirin. Kurdên niha li Kazakistan, Kirgîzîstan û Ozbekîstanê, wê demê jî Kurdistanê Sor hatin derbiderkirin.

### Li Ewropayê perwerdeya Kurdî

Li gelek welatên Ewropî dema dêubavên zarokan bi kêmasî pazdeh bîst zarokan bigihînin hev û bi rîkî di vî warê de têkevin nava hewlîdanan, dikarin derfetên perwerdeya Kurdî bi dest bixin. Minak, Li Berlînê her çendî bi fermî destûra dersên Kurdî hîn nehatiye pejirandin jî, Komeleya dêubavan Yekmal a Berlînê projeyan amade dike, dide şaredariyê û li ser wan projeyan dersên Kurdî jî bi awayekî niv-fermî tînan dayin.

### Li Swêdê

Li Ewropayê perwerdeya Kurdî ya herî bi rêk û pêk li Swêdê ye. Li gor daneyan Swêd, sala 1977'an reformeke zimanê dayîkê pêk anî. Vê qanûna nûjen derfetên gelek mezin dan zimanê biyanîyan. Li vir karê perwerdê bi giranî di destê şaredariyan de ye. Swêde berê bi perwerdeyêke du salî mamoste dan amadekirin, hina jî di vî dibistana pedagojîyê de mamosteyên Kurdî tînan perwerdekirin, li pey jî dibistan vekirin. Li hemû deverên ku Kurd lê hene, bi zaravayên Kurmançî û Soranî dersên Kurdî jî dibistanên seretayî bigire hetanî dibistana amadeyî (lîse) li gor metodên nûjen tînan dayin. Wekî din sala 1984'an "Mala zarokan" hate vekirin, angû bi Kurdî derfetên pêşdibistanî jî hatin bîdestxistin. Di van malan de zarok bi du zimanî tînan perwerdekirin. Li Swêde Weşanxaneya APEC'ê gelek pirtûkên zarokan û ên dersê weşandin.



Dema mirov dîroka perwerdeya bi Kurdî di ber çavan re derbas dike, dibîne ku tu carî yekîtiyeke perwerdê pêk nehate, politikayeke perwerde ya neteweyî di nava Kurdan de rûneştiye. Heta piraniya Kurdan dema peyva perwerdê dibihîsin; Erebi, Tirkî yan jî zimanekî biyanî tê bîra wan.

**Li Elmanya**

Cara yekem senatoya eyaleta Bremenê bi fermî destûra perwerdeya Kurdî da. Li Bremenê sala 1993'yan perwerdeya Kurdî bi çend saetan di dibistanên seretayî de destpê kir. Sala 1994'an jî bi xebatên Yekmalê li Hamburgê bi qadro û nivêkê dersa Kurdî di dibistanan hat dayîn.

Li Saksona Jérîn sala 1993'an, piştî têkoşîneke xurt dana dersên Kurdî hat qebûlîkirin, pê re jî mamosteyên Kurd ên ji ASTÖB'ê qetiyên, di bin navê KOMAK'ê de Yekitiya Mamosteyên Kurd li Saksona Jérîn damezrandin. Piştî amadekariya du salan sibata 1995'an li Leer, Oldenburg, Celle û Hannoverê bi giştî pênc mamosteyan dest bi kar kir.

Kurd herî zêde li eyaleta Westfalya Bakurê Renê (NRW) dijîn. Xebatên dersên Kurdî berê li vir destpêkiribûn. Lê ji ber ku Kurd parçe bûn, her cara yekem hîna nû sala 1997'an dersên Kurdî wek ceribandîna li Köln, Botrop û Bielefeldê li çend dibistanan destpê kir. Niha herî zêde li NRW dersên Kurdî hene û 10 mamoste dersê didin.

**Li Bakurê Kurdistanê**

Dîroka dersên Kurdî li Bakur digihîje sed-sala 12'an. Hem li medreseyan û hem jî li deverên di li mirîtiyên Kurd ev ders hebû. Piştî dan û standînan, di vî beşa di bin dagirkeriya Komara Tirk de cara yekem di pêvajoya aştî û çareseriyê de li Bakurê Kurdistanê hin derfetên dersên Kurdî hatin bidestxistin. Li deverên şaredariyên Kurd li ser kar, bi xebatên TZP'a Kurdî dibistanên Kurdî hatin vekirin, lê ew jî di bin êrişên dagirkeran de man.

**Li Rojavayê Kurdistanê**

Dema Rojava di bin fermîna Fransiyayê de bû, hin derfetên perwerdê hebûn. Piraniya rewşenbîr û serhildêrên Bakur wek Osman Sebrî, Cegerxwîn, Celadet Bedirxan û Nûrî Dêrsimî berê xwe dan Rojava. Her çendî nivîsandin û alfaba Latîni li vir bin-

gehê xwe girt, gelek kes fêrî nivîsandin û xwendinê bûn, kovar û rojname li vir derketin jî, bingeheke perwerdê li vir rûneşt. Di van salên dawiyê de, li kantonên azad dibistan jî bo zarava Kurmancî hatin vekirin, lê di warê materyalên dersê de gelek nû ne û li wir xebatên amadekirina pirtûkan dewam dikin.

**Amadekirina pirtûkên dersê**

Di dema azad de li Başûrê Kurdistanê her çendî jî berhemên klasîkên Kurdî hin metnên wêjeyî hatine hilbijartin jî, bi giranî di bin siya hêzên desthilat de ye, li heremên hizban cudahiyan nîşan didin.

Li welatên Sovyetê jî her tişt li gorî politîka perwerdeya Sovyetê bû. Dema mirov li romanên Erebi Şemo û Heciyê Cindî û yên din dîni-hêrî jî, vî rastiyê bi zelalî dibîne. Pirtûkên dersê jî li gorî vî dihatin amadekirin. Her wisa karîkera politîka perwerdeya Ermenistanê jî li perwerdeya Kurdî ya li wî welatî bûye ku civaka Kurd û ya Kurdên Êzîdî jî hev çihê kiriyê û hîna jî dike.

**Li Swêdê pirtûkên dersê**

Her çendî her dewleta Ewropî xwedanê politîka perwerdeya neteweyî jî be, jî hermanên navneteweyî re rêzê digirin. Li Swêde mamosteyên ders didan hem wek şexs û hem jî wek komîsyon dest bi amadekirina pirtûkên dersê kirin. Lê ji ber ku piraniya pirtûkan jî bo dibistana seretayî û navîn hatin amadekirin, hem kes, hem jî komîsyonan jî hilbijartina metnên wêjeyî bêhtir, her kesî yan jî komîsyonê hewl da ku bi xwe metnan amade bike û bi kar bîne. Pirtûka herî bi rêk û pêk "Dergûşa Nasnameyê" ye, ev pirtûk jî bo dibistana amadeyî (lîsê) hatiye amadekirin. Di vî berhema dersê de helbest û metnên klasîk û yên dema me hatine hilbijartin. Helbestên Melayên Cizîrî, Feqiyê Teyrañ, Ehmedê Xanê, Melayê Bateyî, Siyahpûş, di bin navê "Pirên di navbera edebiyata kevîn û nû de" jî metn û helbestên Cegerxwîn, Tirêj, Sebrî

Botanî, Osman Sebrî hatine hilbijartin. Di bin navê "Edebiyata Kurdî ya nû" de jî ji Celadet û Erebi Şemo destpê kirine û hetanî Helîm Yûsiv û Ehmed Huseynî hatine. Di vî de çih dane destanên Kurdî û dengbêjiya Kurdî jî.

**Li Elmaniyayê pirtûkên dersê**

Di sala 1993'an de Yekitiya Mamosteyên Kurd (YMK) hate damezrandin. Di nava YMK'ê de komîsyoneke amadekirina pirtûkên dersê hebû. Vî komîsyonê jî bo pola 1, 2, 3, 4, û 5'an pirtûk û materyalên li gorî metodên nûjen amade kirin. Di van pirtûkan de jî amadekarên pirtûkan bi xwe metnên mijaran nivîsin, hin çirokên zarokan jî ji Elmanî wergerandin.

**Li Kurdistanê pirtûkên dersê**

Li Kurdistanê pergala perwerdeyeke navendî tune. Ji ber vî egerê jî di amadekirina pirtûkan de jî saziyeke navendî pêk nehate. Li Başûrê Kurdistanê perwerde bi Soranî ye. Metodên perwerdeyê hê bi giranî li ser bingehên pergala perwerdeya olî ne û têkiliyên wê û perwerdeya zanistî gelek melûl in. Li aliyê din jî ber ku alfabe û zarava cuda ye, sudekê nade beşên din û ti bandorekê wê li deverên din nebûye. Ji ber sîstema alfabe ya Erebi pirtûkên dersê yê li vir hatine amadekirin nebûne bingehê perwerdeya giştî.

Li bakur li hin bajaran jî hev qut hin komên amadekirina pirtûkan hatin damezrandin. Institûta Kurdî jî bo mezinan bi navê "Hinker" du pirtûk amade kirin.

Bi kurtî hetanê perwerdeyeke navendî bi rêberiya politîka perwerdeya neteweyî pêk neyê, dê berhemên di dersê de tîn bikaranîn jî di warê metnên wêjeyî de, melûl yan jî yek allî bimînin.

**Encam**

Dema mirov vî dîroka perwerdeya bi Kurdî di ber çavan re derbas dike, dibîne ku tu carî yekîtiyeke perwerdê pêk nehate, politikayeke perwerde ya neteweyî di nava Kurdan de rûneştiye. Heta piraniya Kurdan dema peyva perwerdê dibihîsin; Erebi, Tirkî yan jî zimanekî biyanî tê bîra wan.

Perwerde tim di bin siya politîka hin bawerî, kom û dewletên dagirker de maye. Perwerdeya li medreseyan li gorî politîka perwerdeya baweriya Îslamî hatiye meşandin. Lema dema mirov li mirîtiyên navê wan di Şerefnameyê de hene dinêre, dibîne ku her kesî xwe biriyê riçalekî Ereban ve girêdaye. Hemû şex xwe dolê Ereban dibîne, Seyid jî her wisa.

Her kom, partî û heremî di dersan de dîroka koma xwe, metnên çirokên kom û baweriya xwe, henek û helbestên li gorî baweriya xwe pêk anîne û tînin.

Gelek alfabe yê nû cûda hatine bikaranîn û iro jî alfabe yê Aramî, Kirilî û Latîni tîn bikaranîn. Metodên di dersan de hatine bikaranîn jî jî hev gelek cuda ne. Mînak, li medreseyan û li Başûr hê jî bandora metodên fêrkirina Erebi heye. Li Ewropayê jî metodên nûjen ên pedagojîk li kar in.









FOTO:AMER PINAR

# ZIMANÊ KUÇEYÊ

► Bawer RÜKEN

● Teoriyên qerase, pirtûkxaneyên ji kitêban dagirtî, avahiyên mezin yê zanîngehan, zanista zimên a ku bi her hawî derbarê zimên de şîrove û îzehatên xwe hene. Eger tenê di wan quncikan de asê mabe û nebûbe zimanê kuçeyê emrê xwe kin e.

**K**aç pirsgirêkên pêşketin û geşkirinên zimanê Kurdî tîr rojevê pê re gelek tiştên din jî derdikevin ser sehneyê. Di serî de xirecira şîretan li hewa difirin. Di çapemenî, televizyon, malper û tora civakî de ji her seriyekî gotinek derdikeve. Piraniya wan gotegot û xireciran li ser şîretên xav ava dibin.

Hinek meseleyê giran dikin. Dikin ya man û nemana hestiyariyê. Bi hisên netewperestiyên hişk bi ser ên din de dikin qerebalix. Hinek bi minak dayînên welatên xelkê pirsgirêkê muqayese dikin. Teoriyên qerase, fikrên felsefîk ên balkêş û zanista zimên a ku bûye gilok di Kurdî de berê munaqaşeyê didin çol û kerbelayan.

Di vê meseleyê de jî mîna gelek meseleyên me dema dikeve rojêya siyasatê, hingê dikeve rojêya Kurdan jî. Destpêkê wek bertek nişan dayîna qehrok derdikeve holê. Mîna reflekseke tundwer tê ditîn û di demên pêşin de li ser vê yekê niqaş û munaqaşeyên klîşe dimeşe. Bêguman wan deman bi hêza heyecan û bi êşa îspatkirina hebûna zimanê Kurdî gotin li hewa difirin. Tavilê plan û projeyên seyr, meş û xwepêşandanên çalakvaniyê ên ku li ser refleksên nişkavdayî avabûna eyan dibin. Bêyî saxlemkirina bîngehan û nasîna dînamîkên zimanê xwe bi ber bayê gotinên dagirkeran dikin. Halbûkî kesên baqil bi rêbazên wiha jirêzê û erzankirina zimên ranabin. Jixwe piştî demekê - dema ji rojêya siyasatê dikeve- ji rojêya Kurdan jî dikeve heta. Yanê dîsa rojêya pirsgirêkên Kurdan bi rîya siyasatê, si-

yaseta dagirkeran tê tayînkirin.

Helbet zimanê Kurdî bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû ye. Meseleyên li ber zimên jî hêla her kesî ve pîr hindik eyan e. Ji pîrbûna zaravayan bigire heta zêdebûna devokan. Ji qutbûna parçeyên Kurdistanê bigire heta qutbûna siyasatên navbera Kurdan de... Muheqqeq ev jî bo sazîkirin û avabûna dewleteke netewî pîrgirêkên mezin in. Standartkirina zimên, sazîkirina mêjûyekî kurdewar û pêkanîna ruhekî netewî pêşîya pêşin yekîtiyê dixwaze.

Wekî ku ji hêla her kesî ve tê zanîn meseleya avakirina yekîtiyêkê meseleya siyasî ye. Û heta ku otorîteyêke hevpar a siyaseta Kurdistanê çênebe, dê ev meseleya jî ji holê ranebe. Qe nebe heta niha wiha xuya bûye.

Lêbelê li vir ez dixwazim balê bikişînim ser tiştêkî din. Zimanê Kuçeyê. Bi gotîneke din bikaranîna zimanê Kurdî di jiyana rojane de. Yanê zimanê li kuçeyê.

Ziman jî wek hemû bûnnewerên xwezayî zindî ye. Organîk e. Yekser bi mirov re peywendîdar e. Girêdayî dil û mejiyê mirov e. Danûstandinên ragihandîni ên bi rîya zimên tîr avakirin di eynî demê de rengê wê civatê jî diyar dike. Çi ku bîra mirov ya zimên herî zêde li kuçeyê zindî ye. Ji jiyana rojane hildibere û dîsa dide jiyana rojane. Tevî hemû kêmasiyên xwe zimanê li kuçeyê tê bikaranîna zimanekî emrîdirê. Eger meriv bi-bêje kuçe dilê jiyana rojane ye wê ne mubalaxa be.

Erê, rast e zimanê axaftinê ne li gorî gramer, rastnivîs û rastxwendinê tê xwendin û tê nivîsîn. Heta hin caran li gorî xwe jî zimanê din jî gotin tev lê dibin. Ji zimanên biyanî jî dide û distîne. Tiştên di mantiqî nîvîsê de ên rêkûpêk hene di axaftinê de tune ne. Bi gotîneke din zimanê axaftinê zimanekî dengî ye. Yanê li ser dengan bilind dibe. Her kî ku diaxive gotin û peyvên li gorî meji û hisên xwe vedibêje. Di her axaftinê de bi hawiyekî bûnneweriya xwe jî dide der yê ku diaxive. Ji nîvîsê hin serbestir û afirînertir e. Çi ku qalib û sinorên di nivîs û xwendinê hene di axaftinê de tunene. Ev jî çîhanê cuda, xeyalên bêdawî û tesawûrên firehtir li ber meriv vedike.

Teoriyên qerase, pirtûkxaneyên ji kitêban dagirtî, avahiyên mezin yê zanîngehan, zanista zimên a ku bi her hawî derbarê zimên de şîrove û îzehatên xwe hene. Eger tenê di wan quncikan de asê mabe û nebûbe zimanê kuçeyê emrê xwe kin e. Ne zindî ye. Mîna mirovekî jî dinyayê izolekîrî tenha ye û hêdî hêdî li benda mirina gewdeyê xwe dimîne.

Lêbelê zimanê li kuçeyê diji zimanekî zindî ye. Mîna hestî, xwîn û bi goşt e. Ji nava jiyana rojane şax ber dide. Tev li ruh û dilê civatê dibe. Mirov pê xewnan dibînin, xeyalên baskfireh ava dikin û bîra hebûna xwe pê dipêçin. Ku hingê dibe zimanekî zindewar û emrê hebûna xwe di her şert û mercên dijwar de berdewam dike.

# Hevnasîna

# Hawar û Riya Teze

**D**î sed sala 20'an a wêjeya Kurmancî de meriv dikare qala du êkolên sereke bike. Yek ji wan Kovara Hawar û nivîskarên wê, ya din jî Riya Teze û nivîskarên wê ne. Her duyan jî bêyî haya wan jî hev hebe, dest bi karê weşangerî û wêjekarîyê kirin. Ji bo nivîskarên ciwan ên vê demê her du weşan jî dibû rawestgeha yekemîn. Cihê xwe îsbatkirin û kemilandinê nivîskarîyê bû. Jixwe gelek kesên ku rêya xwe bi wan her du weşanan xistin, di wêjeya Kurmancî de bûn pêşengên şewaza modernîzmê.

Gelo meriv dikare ji wan her du êkolan yekê wêkî 'navend' a din jî wêkî 'cih' bi nav bike? Gava ku em dêhna xwe didin analîz û lêkolînên li ser wêjeya Kurmancî, meyla bîçîkirina Hawarê li navendê zêdetir e. Hin rexneyên li êkola Riya Teze yê wêkî nivîsandinê bi zîmanekî devokî, bandora îdeolojîk û qelsiya hûnandinê mijarê û hwd, di hişê mirovan de bîçîkirina 'cihibûnê' xurt dikin. Her wiha rengdêra 'sazûman-karî' jî bo çîrok, helbesta modern jî - her çiqas hin gengeşî dewam bikin jî - di derbarê vê mijarê de li êkola Hawarê tê îstinad kirin û îmajekê 'navendî' jî bo Hawarê tê qewîkirin.

Mijara vê nivîsê ne rûberîhevîkirina her du êkolan e, hevnasîna her du weşanan e. Ji ber ku Riya Teze weşana fermî ya Partiya Komünîst a Ermenîstanê bû, ne pêkan e ku li wir behsa Hawarê bike. Lê di Hawarê de di hejmarê 8'an de (12 Îlona 1932'yan derçûye) cara ewil behsa Riya Tezê û weşanê din ên çapbûyî tê kirin.

Celadet Bedirxan, bi navê Herekol Azizan der barê Rojname Riya Teze de agahiyên dide. Ji nivîsên wî xuya dibe ku hê nû haya wî ji rojnameyê çêbûye û dixwaze bi wê nivîsê Riya Teze silav bike. Celadet wiha dinivîse:

"REYA TEZE Rûjnameke kurdmancî, bi herfên nû, bi kurdmancîyê xwerû, li Rewanê, di şiklekî spehî û çeleng de derdikeve. Li gora ko Rêya Teze rûjnameke deh rûjki ye, berî salkê û hin dest bi derketinê kiriyê. Em ji hevalê xwe re rêyêke xweş û dawîyêke geş hevî dikin. Divêt ko her gav me hay jî hev hebit û gerek e ko em hevdu ser xebata hev serwest bikin."

Nivîsa xwe bi helbesteke zarokan a jî pirtûkê jê re hatî şandin, bi dawî dike.

Bivênevê, di serê mirov de pîrsa gelo Celadet çawa ji hebûna Riya Teze agahdar bûye, peyde dibe. Jixwe Celadet Bedirxan di kovarê de tiştên ku bi Kurdan re têkildar ên ku ji weşanê cihêreng ên biyanî derçûyî, radigihand xwendevanên xwe. Wêkî minak di hejmarê 19'an a Hawarê de Celadet behsa kovara Zerdestên Hindîstanê dike û ji kovarê, gotareke Îngilîzî werdigire û van agahiyên li jêr dide:

"Birayên me ên zerdestî, li Hindîstanê, di Bombayê de kovarakê bi navê (Iran lig) bi zîmanê Îngilîzî û farisî derdixînin.

Kovara Zerdestîyan di hejmareke xwe de qala serxwebabûna mîletê kurdan kiriyê û di heqê me de çend pîrsên biheq û dilovan nivîsandine. Herwêkî me ew bendika ha jor ve û weke xwe guhastiye stûnên xwe jêr ve ji werdirîninê zarê xwe."

### 'Radyo Qefqasê'

Celadet li kû derê, dengê Kurdî û Kurdewarî were, tavil xeber û mîzgîniya wê digihîne xwendevanên xwe. Çî radyo be û çî rojname be, çî kovar be, guhên wî pel bûn û çavên wî bel. Di hejmarê 27'an de Celadet behsa radyoyê bi Kurdî dike. Di serenava 'Di Radyowê De Weşînekên Kurdî' de 'Radyoya Rohelat', a ku li Beyrûte weşan dikir û 'Radyoya Bexda'yê dide nasîn û agahiyên dide der heqa wan de û piştre behsa 'Radyoya Rewanê' dike lê li ser Radyoyê ne serwest e, tenê bihistiye bi Kurdî jî weşanê dike. Ji ber vê yekê, ji bo wê dibêje, 'Radyo Qefqasê' bang li Kurdan dike û wiha dinivîse:

"Me çend caran jî stasyonêke Qefqasê stranîne kurdmancî bihistine. Lê heta niho me nizanî ew kîjan stasyon e, kengê û li ser kîjan pêlan diweşîne. Me gumana Rawanê kiriyê. Me hevî jî xwendevanên xwe heye heke pê dizanin bila ji me re bidin zanîna ku em pronivîsa wê stasyonê jî di Hawarê de belav bikin."

### Nasîna Riya Tezê

Lê di nasîna wê ya Riya Tezê de navekî qedirbilind derdikeve pêşberî me. Ev kes Heciyê Cindî ye. Wêjekar, filolog û folk-

lor nas Prof. Dr. Heciyê Cindî bi rêya nivîskarê Ermenî Prof. Dr. Harutyun Migirdîçyan rojnameyan dişîne ji Celadet re. Ihtîmaleke mezin Heciyê Cindî bi riya endamên Federasyona Şoreşger a Ermenîstanê (Taşnak) yê li Sûriyeyê, jî hebûna Hawarê serwest dibe û têkiliyê bi Celadet re datîne.

Keça Heciyê Cindî û hevjiya Ferîkê Ūsiv, Firîda Hecî Cewarî di pirtûka xwe ya bi navê "Bîranînê min" de jî devê Harutyun Migirdîçyan wiha qala serhatiya şandina nameyan dike:

"Hecî minra go: 'Dixwazim pirtûkên dera û çend rojnameyên Rya teze bixînim Sûriyayê, Bedirxanra. Min jî ji karkirê (navê wî vê demê nayê bîra min) Partiya komünîstiyê pîrsî, ka nê em dikarin pirtûk û rojname wanara bixînin? Ewî go: "Ezê sibê bersîva te bidim". Hilbet, ewî jî ji mezinê xwe pîrs kiribû, û piştî du roja ewî gazî min kir, go: "Hevalê Mikirtçyan, hun gere xwexwe wan pirtûk û rojname bixînin. Bişînin, bera bizanbin, wêkî li Ermenîstanê çî to mecal hatine saz kirinê bona pêşdaçûyîna çanda kurda..."

De, piştira, Hecî pirtûkên dera, çend hejmarên rojnamê anîn mala nivîskara, adiresêk jî da min û min jî ser wê adiresê şand, adiresê jî bir da wî hevalî.

Ev bûye rastî! Dadê min derheqa vê yekêda got û dubare zêde kir: Bi destûra Sûriyayê."

### Piştî çend salan pê dihisê


Firîda Hecî Cewarî piştî çend salan, bi saya gotara Temûrê Xelîl pê dihisê ku nameyên Heciyê Cindî gihane ber destê Celadet Bedirxan. Her wiha di heman pirtûkê de behs dike ka çima bavê wî tê girtin û çima wan jî naveroka nameyên Celadet Bedirxan tune ye û name çawa tîn şewitandin:

"Min zanibû, wêkî roja girtina bavê me -18 adara sala 1938-a, wexta polis bona ditîna izbatan navmala me serobîni kiribûn tenê hejmareke kovara Hecî Cewarî ya 24-a ditibûn, lê hijmarên din, ku diya min nava sova diwêrda, bin êzîngada weşartibûn, wana neditibû (Her sal 15-e meha adarê mala bavê min îda sove venedixistin û darê ku ber diman dîldrine nava wê sovê. Girtina bavê min jî pey 15-e adarê bû). Belê, çend nemên Celadet Bedirxan, çend kovarê Hecî Cewarî û usa jî çend nemên din mala ineda hersal usa dihatine weşartinê. Lê wexta ev pêla dudu destpê bû, gava merivê amûtam disa digirtin, sirgûn dikirin, rihetiya bavê min tunebû. Destê wî nedîçû wan tiştê bavêje, bişewitîne, dayika me jî newêrbû hêrsa bavê me rake."



Her wiha nivîskar Eskerê Boykî jî di pirtûka xwe ya bi navê 'Nûra Elegezê- Çend dîdem jî edebiyata Kurdên Ermenîstanê' de behsa sedema girtina Heciyê Cindî dike (di pirtûka xwe de girtina Heciyê Cindî berevajî Firîda Hecî Cewarî ne weke 18'ê Adara 1938'an lê belê ya 1937'an diyar dike) û dibêje ku yek ji sedemên girtina wî nameyên wî ne ku jî Celadet re şandine. Nivîskar li wir behs dike ku Heciyê Cindî ne tenê jî ber şandina nameyan hatiye girtin û wî jî bahoza Stalinîzmê para xwe girtiye û bûye hedef.

Li gor salixên keça Heciyê Cindî, Firîda Hecî Cewarî, meriv têdigihîje ku Heciyê Cindî bixwe jî nizanibû ka nameyên wî gihîştine Celadet yan na. Jixwe çend salan piştî şandina nameyan, Heciyê Cindî tê girtin û bi xebatên dij-şoreşgerî û casûstiyê tê tawanbarkirin. Salekê di hepsê de dimîne û di pirtûka Firîda Hecî Cewarî ya "Heciyê Cindî- Jîyan û Kar" de hestên wî piştî derketina hepsê wiha raberî me dike:

"Rast salekê şûnda Hecî vejeriya malê. Ewî roja girtin-berdana xwe, roja 18 adarê, kivş kir çawa roja bûyîna xwe."



Ibrahim BULAK



# Şakiro û dengbêjî

**E**m an çep lédixin an ji rast. Navber tune ye li ba me. Me demeke dirêj dengbêj tune hesabandin.

Bêguman tu tişt belesebeb rû nade. Her tiştê ku diqewime, ji ber sedemêkî rûdide. Sedema wê xemsariya li hember dengbêjan jî, êş û jana parçebûna Kurdan bû.

Piştî salên şêstî, dema şoreşger peyda bûn, li hember dengbêjan helwest nîşan dan û ew bi geşkirina şerên birakujî, şerên navxweyî gunehbar kirin. Û mixabin ev gunehbarkirina wan jî ne bê bingeş bû. Hinek kilamên şeran mîna kilama 'Şerê Xal û Xwarzan' trajîk jî bin, piraniya wan wek propogandayekê bû. Mixabin îro jî hin rexşenbîr û rojnamevan li ser pirsgrêkên di navbera Kurdan de rexnegirî nakin, bi pênuşên xwe xwin û jehrî dirêjin. Ger siyasethedarmên Kurd jî bi ya wan bikin wê qira hev bibin. Ecêb e ku siyasethedar jî 'rewşenbîran' nermtir û aramtir bin di van pirsgrêkan de an na?

Em zêde şiverê nebin, ji mijarê dûr nekevin.

Ji ber wê helwestê hetanî carekê bavê min ji Êlihê bi du kasetên Şivan venegeriya, teyb neket mala me. Bavê min pir hişk bû li hember dengbêjan jî ber kilamên şeran.

Piştî ku hunermend û komê mûzîkê ku bi giranî li ser êş û azara Kurdan distiran, zêde bûn, dengbêj hema bêje bi temamî hatin jibirkirin.

## 'Kilamên wan yên evîne pir xweş in'

Sala 91'ê birayekî min kasetfiroşiyê dikir. Êvarekî dema got: "Îro min kaseta Şakiro danibû ser, erebeyê ku derbas dibû yekcar sekini, yê li dû hat ji paşve li erebê wî xist, camêr qet li erebeya xwe jî xwedî derneket, negot ka çî pê hat, yekser derbas bû hate ba min got, çiqas kasetên wî hebîn bide min." Bala min kişand.

Hêza wê hezkirinê jî kû dihat?

Piştî min lê guhdarî kir, tê gihîştim ku me neheqî li dengbêjan kiriyê. Dema ez çûm Êlihê min ji bavê xwe re behsa Şakiro û hunera wî kir, wî got: "Şakiro? Şakiro şahê dengbêjan e" û ez heyrî hîştim.

Min jî jê re got: "Ê te çima berê bi xerabî behsa dengbêjan dikir?"

Ewî got: "Kilamên şeran di nav Kurdan de neyartiyê kûr dikir, lê kilamên wan yên evîne pir xweş in..."

## Derhênerê mûzîkê ye, lê ne nota dizane ne jî dikare li amûrekê bixe!

Wekî ku ez bi salan hatibim xapandin li min hat...

Piştê ketim şopa Şakiro, min dixwest îleh wî bibînim û hevpeyvînekî pê re çêbikim. Sala 93'ê li Mazlum Plak rûniştibûm, min jî xwediyê şirketê re qala Şakiro kir. Yekser gote min, ev saleke ku bandeka Şakiro li balê ye, lê dernaxe. Ji ber ku kes dengbêjan guhdarî nake, wê neyê firotin.


Min lê guhdarî kir, xweş distrê lê ne Şakiro bû.

Bi sond û selewatan dixwaze bi min bide bawerkirin ku Şakiro ye, lê guhên min baş in, ne qabile ez du dengên ew-qas çihêreng tevlihev bikim.

Di dawiyê de me hev serwest kir ku ew jî Şakiro ye lê ne ew Şakiro ye, wek Şakirê Biçûk tê nasandin...

Min zext da ser ku çap bike.

Piştî demekî min pê da qebûl kirin. Wî jî ji ber zora min li



**Şakiro: "Deynê min li kesî tune! Miletê Kurd li dengbêjen xwe xwedî dernakeve. Weyselekî Tirkan hebû te wi bidita dilê te li hev diket, te nikaribû xwarin bixwara. Çawa lê xwedî derketin? Resoyekî me hebû, ji birçîna mir!"**

ser bergê kasetê, navê min wek derhênerê kasetê da nivîsandin. Bûm yekem derhênerê mûzîkê ku ne nota dizane ne jî dikare li amûrekê bixe.

Şakirê Biçûk hat, min ew bir Navenda Çanda Mezopotamya, him kilam pê da xwendin him jî hevpeyvîn pê re çêkir.

Ew kaset wisa hate firotin ku li nav şirketên mûzîkê de fûreyê dengbêjan dest pê bike.

## Deynê min ji kesî re tune!

Ez hin jî li dû Şakiro bûm, Şakirê Mezin... Min rêça wî li İzmirê dit. Ji bo hevpeyvîne çûme İzmirê. Ji bûroya rojname ya İzmirê Mehmeşah Yildiz jî bi min re hate mala wî.

Wekî her hunermendekî hunerxurt, ew jî ji hunera xwe, berî her tiştî jî dengê xwe bi bawer bû û jî ber jibîrbûnê jî dilşikestî.

Ji aliyekî ve dilşikestî, xeyidî bû û nedixwest hevpeyvîne bike, ji aliyê din ve jî, bi şeweyekî qurnaz, dixwest fêhm bike ka wê tiştêkî bigihê destê wî an na. Dema fêhm kir

ku ez pere nadimê, xwe sist kir, min zor dayê, tam nerm bû, li ber qebûl kirinê bû, hevalê me Mehmeşah li ser welat, gel û xwîna şehîdan dest bi ajîtasyonê hişk û vala kir, Şakiro yekser got: "Deynê min ji kesî re tune! Miletê Kurd li dengbêjen xwe xwedî dernakevin. Weyselekî Tirkan hebû te wi bidita dilê te lihev diket, te nikaribû xwarin bixwî. Çawa lê xwedî derketin? Resoyekî me hebû, ji birçîna mir!" Û rê girt...

Disa jî min ji bo rojeka din, soz jê girt...

Roja sozê wî hat, ez disa çûm İzmirê, jixwe me hev nedit. Wî geh gote min ez nexweş im, geh got ez ê herim derveyî bajêr.

Dem a min fêhm kir ku îleh çavê wî li tiştêkî ye, ez jî aciz

bûm, min dev jê berda û jî bo dest vala venegerim, min çû karekî baş kir; bi Ayşe Şan re hevpeyvîn çêkir.

## Dengbêj cardin bûn xwedî rûmet

Piştê xwediyê Mazlum Plak çû İzmirê, mafê kasetên Şakiro bi erzani kirî.

Dem a kasetê wî ya yekemîn derçû, nivîsa bergê min nivîsand û li ser bergê bi gotina bavê xwe min wî wekî şahê dengbêjan bi nav kir û di nav gel de wekî şahê dengbêjan hat qebûl kirin.

Dengbêj bi lez cardin bûn xwedî rûmet...

Rewşenceşê navdar Muhsîn Kizilkaya li ser dengbêjan kitêb nivîsand lê nizanibû dengbêj kî ye, dengbêjî çî ye?

Dengbêjiyê weke wejeya Kurdî nixandibû. Ev nêrina şaş ji aliyê gelekên ve hate qebûl kirin. Dengbêj ne nivîskar in û ne hozan in... Dibe ku pênc kilamên Şakiro tunebin. Jixwe vegotina kilamên ku Şakiro distrê, bi piranî jî devê jinan bû.

Di vî hunerî de berî 'bêjê deng tê, lê çî kirin? Dengê rakirin tenê bêjê nixandin û wê jî şaş nixandin. Dengbêj berî her tiştî, hosteyê dengê ne, ne yên gotinê ne.

Ha, di nav dengbêjan de hosteyê gotinê jî tune? Hene, bêguman hene...

Kî ne ew?

Ev bixwe jî mijara lêkolînekê ye.

Hinekan li ser dengbêjen jin nivîsandin. Lê mixabin ev jî bê bingeş e. Dengbêjiya jinan tune ye, tevî ku gelek kilam jî jinan hatibin wergirtin jî. Dengbêji karekî profesyonel e û li gor civaka Kurdan ne mumkun bû ku jinan vi karî bikira. Pênc sal berê, jinek rûne dîwana mêran û bistrê...

Dengbêjiya jinan ev çend sal in dest pê kiriyê. Berî ku dengbêjiya jinan dest pê bike, dest bi nivîsandina dengbêjiya jinan hate kirin.

Em Kurd in dive çihêrengiyekê me hebe an na?!



Rahmi BATUR

# 'Nameyekê ji dayika min re bişînin'

Şaristan NURHAQ

**S**ebrî Serhed ango bi navê din Bulent Erbaşlı sala 1978'an li Mereşê tê dinê. Ew ji eşîra Kiliçli ye. Eşîra wî di herêma Mereşê de hem pir mezin e û hem jî gelekî bi nav û deng e. Lê ji ber zextên dewleta Tirk malbata wî cih û warê xwe dîtînin û berê xwe didin welatên Ewropayê. Serhed li Ewropayê tevgera PKK'ê dinase. Piştî ku nasîne tevî xebatan dibe. Dema ku di sala 1999'an de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji aliyê welatên Ewropayê ve bi komployekê radestî dewleta Tirk tê kirin, Sebrî beşdarî gerîla dibe. Li dijî vê komployê bersîva xwe bi tevlibûna gerîla dide dijminên gelê xwe.

Gerîla Serhed, li gelek qadan tédikoşe. Salên xwe ên destpêka gerilatîyê li herêma Qendil, Xakûrkê dibihurîne. Li van qadan têkoşin dide. Piştî pêngava 1'ê Hezîrana 2004'an berê xwe dide herêma Serhedê û nêzî şeş salan bi rihêkî fedai û dilekî germ beşdarî pêngavê dibe. Tevlî hemû zorî û zehmetîyan dibe. Ew jî bo xwe tu caran zorî û zehmetîyan nake asteng.

Rêhevaleke wê wiha behsa wî dike; "Şehîd Sebrî xwedî gelek taybetmendiyên veşartî bû. Mirov cewherê veşartî di tevlibûna wî ya jiyane de didit. Di çûna ser her karî de jî dil bû. Di jiyane de du taybetmendiyên wî herî zêde bala me dikişand. Yek ji wan tégihîştina wî ya kedê bû. Ya duyemîn jî dilnimzî bû. Tégihîştina wî ya jî kedê re bê sînor bû. Wî bawer dikir gerilabûyîn bi kedê tê hûnandin. Taybetmendiyên kurdîni di xwe de parastibûn. Hizrên xwe, dilê xwe û tevahî jiyana xwe bi kedê re strandibû. Ji eniya wî her tim xwêdan diherikî. Ji bo wî rûniştin mirin bû".

Serhed, bi tevlibûn û hezkirina xwe ji jiyana gerîla re, şopên mezin di dilê rêhevalên xwe dide çandin. Di nav rêhevalên xwe de hezkirin û girêdana bi jiyane re çawa çêdibe, dida nişandin.

Rêhevala wî, li ser dilsoziya Serhed ji Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re wiha dibêje; "Heval Sabrî pir jî xwendin û nivisandinê hez dikir. Bi taybet pirtûkên Rêber APO dixwendin. Dixwest tiştê rêbertî dibêje fêhm bike û di jiyana xwe de pêk bîne. Bi cewhera xwe ya paqij û bi rastiyên xwe tevli jiyane dibû. Tu carî bi hesab tevli jiyane nedibû.

Ji bo her tim hevaltîya rast bi Rêber APO re bijî, di nav heildanan de bû. Ev taybetmendîya wî dihişt jî aliyê hevalbendê xwe ve hezkirinekî mezin bi dest bixe. Dixwest lajiqî keda Rêber APO bibe. Ji bo heval Sabrî wiha gotin hin rastçîne; 'fedaiyê kedê'.

Sabrî Serhed, beriya ku şehîd bikeve gelek caran bi rêhevalên xwe re behsa nivisandina nameyekê ji dayika xwe re dike. Lê ew dibêje; ez binivisînim dibe ku negihîje dayika min. Di gelek sohbetên xwe de qala nameyê dike. Yek jî rêhevalê wî jî li ser vê wiha dibêje; "Me dema jî heval Sebrî pirs dikir, tu yê çima nameyê binivisîne? Wî digot; 'Ez dixwazim di nameyê de vê jiyana xweşik û bi kedê mirovan ava dike vebêjim. Dixwazim jiyana şoreşgerên jî bo welatê xwe şer dikin çawa ye vebêjim. Bila dayika min rastiya me binase. Ji ber ku her dayikeke ku dibe dayika şoreşgeran, pêwîst e jiyana şoreşgerê xwe nas bike.' Wê demê me li herberî vê bersivê matmayî man. Min jî xwe re got, pêwîst e ez jî weke heval Sebrî vê jiyane hez bikim û bidim jiyandin."

## Xwe jî bo hevalan feda kir

Serhad, li gel komek rêhevalên xwe di sala 2008'an de, bi pasterên dewleta Îranê re dikeve nava pevçûnê. Yek jî rêhevala wî ya ku di heman pevçûnê de bû wiha behsa wî dike; "Wê demê dewleta Îranê gelek hevalên me şehîd xistin. Di 28 Hezîrana 2008'an de em bi hêzên Îranê re ketin nava pevçûnê.



Taybetmendiyên kurdîni di xwe de parastibûn. Hizrên xwe, dilê xwe û tevahî jiyana xwe bi kedê re strandibû. Ji eniya wî her tim xwêdan diherikî. Ji bo wî rûniştin mirin bû.

Berîya em bikevin pevçûnê roja berî wê sê hevalên me bi navê Sîdar, Dicle û Silav di encama operasyona dewleta Tirk a li Tendûrek de şehîd bûbûn. Şehadeta wan li ser me pir bandor kiribû. Kin û hêrsa me mezin bû. Hêrs û kîna heval Sebrî jî li hemberî dijmin mezintir bû. Ev roj jî bo xwe wek firsendekî dit ku êdî tola hevalên xwe jî dijmin rake. Em 24 heval bûn. Ji bo xwe jî cihê pevçûnê durbixin, me hereket kir. Lê pêwîst bû timek heval bikeve pevçûnê da ku hevalên din xwe xilas bikin. Di nav ew tîma derket de heval Sebrî jî hebû. Weke tîma fedayî bû. Ji bo hevalên di xwe xilas bikin wê tîmê bal kişand ser xwe û bi dijmin re şer kirin. Ew tîm pir bi lez jî me qut bû. Û ber bi

girê ve baz da, ew kéli rüyê heval Sabrî bi ken bû. Bi israr ket nava tîmê. Di wê kéliyê de erka xwe ya kedkar, nişan da. Xwe da pêşîya hevalên xwe. Şerekî giran çêbû. Ji wê tîmê du heval bi giranî brîndar bûn û ketin destê dewleta Îranê. Yek heval jî bi birîndarî gihîşt me. Lê heval Sebrî bê dem çavên xwe li jiyane girt. Bi rüyekî ken çû ser dijmin û bi qehremanî gihîşt şehadetê. Di eniya wî de diruşma 'êdî bes e' nivisandibû. Bi evîna Çiyayê Araratê mezin bûbû. Me piştî şehadeta wî li ser navê wî jî dayika wî re nameyek nivisand. Me şoreşgertîya wî jî dayika wî re nivisand weke ku wî dixwest binivisîne. Şehîd namirin û wê her tim di dilê me de bijin."

# 'Delal Can'

► Dizgûnê DEWRÊŞ

Diwana Azer Şiwêş bi navê 'Delal Can' hatî tomarkirin bi pêşgotina Ferda Çetin gihîşt dildarên helbestê. Ferda Çetin, gelekî çikot e, her tiştî bi hêsanî naecîbîne. Heta demarek xas, pak û zelal jê nebîne pêsênê wê nade. Nifirên Ferda Çetin balkêş in... Nifirên dostî û piştपालिया rast in. Xuya ye ji wê hezkirîye.

Helbest pir arogant e. Ewqasî jixwe razî û serhildêr! Sitû natewîne. Dema min rûpelên vê diwanê vekir derbên çakûçê helbestên 'Delal Can' ê li ser rihê xwe, ji kûrahiya dil his kir. Di vê gotarê de min xwest, min çî ji Azer Şiwêş fêm kirîye bi we re parve bikim.

Ez ne Melayê Cizîrî me ku peyvên xwedayî bikim qutnî qumaşê evînê. Ne ji Feqiyê Teyran im ku per û baskên ji ba û bahozan lédim ji efsûna rengên Kadizê bibim rêwî. Ne pêkan e! Ez nabim toza bin lingên wan jî.

Tenê hezkirîna min jî 'gotin'ê ye. Aşiq û dildarê gotin û peyvîvan im. Ewqas nizamim kengê kete mîjîyê min lê "God", navê Xweda ya Ewropîyan e. Heta Îndo german vena wekî "Xot" jî bilêv dikin. "Xot" û "Xwedê" nêzikê hev in. 'Gotin'ê her tim wekî peyvên xwedayî his dikim. Pîroz û bihêz dibînim. Diwanê careke din ev anî bîra min.

Ji wateya hevokan tamê digirim. Yên ku min ji tiliya nigê heya mûyê serî diricifînin yanê. Ez ne li gotinên peyvîvan rasterast; li yên di bêrika wan ya hundirîn de ne digerim. Di zelaliya peyvîvan de kaosa ku jê afirîne bala min dikişînin. Ev di helbesta Kurdî de heye. Kêm bê karînin jî heye û ji kaniyek xurt diherike. Gotin, ne tenê ji helbestê re, ji beşên din yê wêjeyê û zimên re jî hîm e. Ez hêşîrê kenên dil, kenên ku çend kêlî piştî gotinê tîn; çend roj, çend serdem pişt re xwe didin der; kenên derenghatî me. Lê helbesta Kurdî, helbestvanê Kurdî, hunermendê Kurdî wekî civaka xwe sêwî û bêmeccal in. Heya civak xilas nebe, wê her sêwî bimînin jî.

**Şiva wan êş û keser in**

Vergilius, Pierre Ronsard yan jî Geoffrey Chaucer ji navdarî û mezîniya xwe - nezanibîn jî - pareke mezin ji hêza şûrê împaratorên xwe wergirtin e. Sakinên Goristana Montmartreyê dikarin ji me re şahidî bikin. Lê helbestên vî geli

hêz û teqata xwe ji evînê jehrî, ji jehrên evîndar û ji wateyên brûskî werdigirin. Xurîniya wan tofan; şiva wan êş û keser in! Mezîniya wan, di zanîna wan ya 'behnkişîneke' ye ku bostek li jêr di nava sîng de jiyane avdide ye.

Azer Şiwêş di 'Delal Can'ê de nişan daye ku ew, ji vê axîna "bostek li jêr yê di nava sîng de ye" hayedar e. Wî, ji peyvên feqîr gencîyek dewlemend berhev kirîye. Ji kaos û tevlihevîyekê aramî; ji şilotî zelaliyek peyde kirîye.

Di sed û deh rûpelên diwanê de 111 helbest bicîh kirine. Hemû helbest di coka xwe de diherikin û di encamê de hunîkiyê xweşikî li ser rihê mirov direşînin.

Ji bilî dîroka nivîsîna helbestên xwe diwan, ji hêla aramiya rihê Azer Şiwêş jî balê dikişîne. Yanê di nava 12 salan de ji şeweya xwe re tam sadiq maye. Helbesta pêşîn ji sala 2003'yan destpê dîke û sala par yanê sala 2015'an de bi dawî dibe.

**Ji dev û rihê jinê**

Di diwana Azer Şiwêş de xalek jî ya herî girîng jî helbest, jî dev û rihê jinê hatiye deranîn. Wekî ku jineke evîndar jî evîndarê xwe re van gotinan dibêje. Çima em wê dibêjin jî ber ku di 15 helbestan de 17 caran zîmanê jinê yan jî zi-

manê "mê" yî bikar anîye. Ji rûpela 18'an de helbesta nûmera 11'an de dibêje:

*"Û di xatirxwestina te de  
Sebra karxezala deşta te dibim"*

Şeweyeke balkêş e. Ji lewra ev zîman jî mîrekî re bo ku bigihêje vê merhalê; û careke din venegere zîmanê bavîksalarî gelekî zehmet e. Perwerdeyek çiqas zexm, bê tawîz lazîm e edî hesab bikin. Belkî jî divê xwe "ji nûve çê" bike. Gava mirov hemû diwanê kontrol dîke dibîne ku ji 2003'yan vir ve di hundirê xwe de xwe jî vî mantiq û zîmanê bavîksalarî parastîye.

Kurdî jî yek ji zîmanan e ku "nêr" û "mê"ti di hebûn û bîngeha xwe re kevîrê eslî dibîne. Hevokasîya xwe jî li ser vî hîmî saz dîke. Di literatûra Latîni de ku dibêjin "masculin" û "feminin" di helbestên diwana şair me diajans ber dahurîna mijar û mesajên tekstê. Azer Şiwêş, di helbesta xwe de zîman û formekî feminîn bikar anîye. Hevokên nerm, rewan û hêsan berhem çêbar yanê terteam, tambar kirîye. Bi hêsanî tê hêskirin ku berhem, bi destkêriyê xweş "hatiye patin".

Şair, nivîskar yan jî hunermend her tiştên xwe jî derûdora xwe digirin û di formekî pir çûda de jî li paşve vedigerînin. Hunermend bi hunera xwe, van malzeme ango materyalana dîke şiklekî din. Wateyek xwedayî ku lê bar-kir pêşkeşê çav, guh û rih dîke.

Mirovê jî rêzê, gava jî van materyalên rêzê di form û manayê ewqas bilind de dibîne, diheyîre, sermest dibe. Di wê keliyê de hêza hunermendî û hunerê dinase. Hunermend jî rêjeya ferq û qalîte hunera xwe, bi nisbeta têgihîştina ve civakê dipêve. Çer ku avî jî şîr nayê veqetîn, huner jî jî berhemê paşve nayê derxistin. Wê sirayetê rihê materyal kirîye û veqetîn di tu şert û mercî de ne mimkun e. Bi vê jî hunermend dişibe herdê. Her tiştê saf di bedena xwe de nava tevliheviya xwe de dihevine û diparêze.

Di literatûra Elewîti de "Dewrêş" -ne derwêş- kesê bi xwezayê re bûye yek, xwedî kiryarên efsûnî; kesê xwe giyandîye kura-riya rihê xwezayê ye. Gorî vê her tişt jî wê tê û disa li wê vedigere. Loma jî jê re heyran e. Hem jê hez dîke, hem jê ditirse. Ne tîrsa wekî jî dijmin e, na! Tîrsa dîrketinê jî wê aheng û mezinahîyê ye. Eynî libek e 'puzzle' ê ye. Ku jê kêm be 'puzzle' ne temam e. Jê re serê xwe ditewîne xwe, jî wê; wê jî xwe dibîne. Loma jî herdê re dibêjin "Herda Dewrêş".

Huner prototîpek yê wê wateyê ye. Her du -huner û hunermend- bê hev nabin. Yek bê yê din nabe. Hunermend bi zanîn û kêrhatina xwe xweza teqlid kirîye. Berhem xêzek piçûk ya wê formê ye. Diwana Şair jî sedûdeh rûpelan pêk tî û tî de sed û penceûneh car peyva "Delal" bikar anîye. Ne mijara rexneyê be jî ji bo berhemê zaafiyetek teknîkî ye. Bi rasti jî gava ez qaytê peyvên ku şairan jî xwe çêkirine dikim şaş dibim û tam ne pê bawer im ku ev peyva jixwe berê hebû yan şair çêkirîye. Hostatî tam di vir de ye. Lewra tu dizanî ku şair, cambaz ango iluzyonistê peyv û gotinan in. Peyv jî dermanên zimên û tenduristiya aqil in.



Azer Şiwêş di 'Delal Can'ê de nişan daye ku ew, ji vê axîna "bostek li jêr yê di nava sîng de ye" hayedar e. Wî, ji peyvên feqîr gencîyek dewlemend berhev kirîye. Ji kaos û tevlihevîyekê aramî; ji şilotî zelaliyek peyde kirîye.

# Helbest çî ye?

► Restül BALTACI\*

*Helbest keda mejî ye û bi sebrekî mezin û hêja tê nivîsandin. Kesê bê sebir û bêhteng bin, bila xwe nêzikî helbest nivîsandinê nekin. Tiştên bi kedê tê afirandin pîroz e.*

**D**i derbarê helbestê û naveroka wê de heya niha gellek lêkolîn, pênase û şîroveyên berfireh û bi wate hatine kirin. Em jî karin bi pîrsekî weha dest bi nivîsa xwe bikin. Helbest kîjan demê û li kû derê hatiye nivîsandin û serkaniya wê çî ye? Derbarê wê pîrsê de gelek fikrên cuda hene. Hin helbestvan û wêjevan dibêjin "helbest jî olê derketiye" hin jî dibêjin helbest jî efsûnê tê. Bi rastî pênaseya helbestê di nava tevê cûre wêjeyê de ya herî zehmet e. Lê dîsa jî tê gotin ku, guhdarkirina wê, xweşikbûna wê hestê herî germ û nû bi mirovan re diafirîne.

De ka em çavêkî lê bigerin serkaniya helbestê. Li gorî tê qebûlkirin, serkaniya helbestê xweza û cîvak e. Di hêla madi de xweza û cîvak, lê di hêla manewî de xewn, xeyal, hest û rîhên mirovan in. Me got bîngeha xwe jî xweza û cîvakê wergirtiye, nivîsandina wê jî çalakiya helbestvanê afirînerê wê ya hiş û mejî ye. Helbest hunera zimên e. Peyvên helbestê bijare ne. Hevokên wê wekî dantelê li hevûdû tînin nexşandin. Di her peyv û hevokê de watekî giranbûna heye. Deranina hestên ruhî ye. Pêwîstiya jiyaneke nû ye. Bi piranî hestê xweş, tenik û nazik e. Ev hest, bi şêweya helbestê xwe dide der.

Muzîk, şano, çîrok û roman her çiqas jî hevûdû cuda bin jî, li ser heman kokekê dibîşkin û şax didin. Helbest jî wan cuda ye. Taybetiyeke wê heye. Gelek şekil, şemal û şêweyên helbestê hene. Naverokek û armancên helbestan jî jî hevûdû cuda ne. Helbestkar ne bi tenê bi devê xwe her wiha bi devê "wî, wê, em, ez, ew" jî dikare helbest binivîsîne û pêş bixîne. Dîsa bi "hûn û wan" dikare bê ravekirin.

Helbestvanê navdar yê Alman Goethe jî bo helbestê wê şîroveyê dike: "Helbestvan bi helbestê cihanekî nû diafirîne û mirovatiya xwe dide nişan" û wê pênasa bi qedir jê re tîne: "Helbest ber bi rojê ve meşa bi wate ye. Helbest dilê azadiya evîna heqîqetê ye. Fikir û ramana herî zirav û ronahi ye." Pablo Nerûda jî jî bo helbestê wê dibêje: "Helbest serhildan e!" Ehmed Arîf jî dibê "Helbest bi hev çûne, azadî û têkoşîna li hemberî zulmê raperîn e." Mirov dikare bêje helbest paqijîya ruh û wijdana mirov e. Dibistana helbestê nehatiye çêkirin û wê neye çêkirin jî. Çawa zanistî serî li aqil dide, helbest jî serî li hestan dide. Hest û helbest şîrikê hev in. Ji bo wê jî kesê helbestvan divê xwedî xeyalê çêker, şîrîn û mezin be û di xeyalê de nûbûnî biafirîne.

Tê gotin ku helbesta hemdem, bîngeha xwe digihîne Yewnana kevin. Wêjeya Yewnana kevin jî mîna helbesta pêşî didin nişan. Ev jî helbestê Homeros Ilyada û Odysseias ve girê didin. Ev nêzikatiyekî xwe nevend dîtina hemû pêşketinê heyi ye. Lê baş tê zanin ku destana Gilgameş di diroka mirovatiyê de destana yekemîn e û tev mîna helbestê hatiye hûnandin. Belkî bîngeha tevê metinê pîroz jî wê destana

Gilgameş tê. Huner û berhema mirov ya herî xweş û xweşik e. Helbest jiyane baş dixwîne û xweşî û nexweşiyê jî yanê dibîne.

Wekî tê zanin wêje û helbesta gelê Kurd pala xwe daye qonaxê demekî dirêj. Ehmedê Xanî, Baba Tahir, Melayê Cizirî, Feqiyê Teyran û hwd. jî bo zîman û helbesta Kurdî rênçberiyêke bê sinor û bê dawî kirine. Barê helbestvanê Kurd gelekî giran bû. Di helbestên wan de gelek ra û şaxê çandê hene. Diroka gelê Kurd mînaka Avesta ku bi Kurdî hatiye nivîsandin li ser esasê jiyaneke nû ye, li ser esasê wî demê hatiye amadekirin. Vegotinên nivîskî û devkî mohra xwe li wan salan daye. Bi zîmanê helbestî hatiye nivîsandin.

## Hevalên bê hevalan

Helbest ne melodî ye. Lê dikare jî helbestê melodiyên gelek xweş û rind bînin afirandin. Helbest stran e lê dikare jî helbestê stranên pîroz bi wate û maqûl bêne gotin.

Helbest keda mejî ye û bi sebrekî mezin û hêja tê nivîsandin. Kesê bê sebir û bêhteng bin, bila xwe nêzikî helbest nivîsandinê nekin.

Tiştên bi kedê tê afirandin pîroz e. Divê her mirov jî kedê re bi rêz û hurmet be ku helbest di serî de qels, kêm be jî, di nav pêvajoya demê de dikemile, digihêje asteke baş. Giyan bi mirov gelek tiştan dide fehmkirin.

Her helbestvan di serî de êşa welatê xwe birînê gelê xwe tîne zîman. Dibe neçîrvanê peywan, carna li çîyayê, carna jî li ser golekê ye. Carna jî dibê kevoka aşîtiyê. Carna jî teyrê baz e di cenga rûmetî de. Xwe li nava rûpelê ramana dirokê dixê. Dibe gernas, dibe vîn û evîna cîvaka xwe. Mamoste û filozofê mezin Ehmedê Xanî jî bo cîvaka xwe û jî bo nivîskar û rewşenbîra vana dibêje: "Em hevalên bê hevalan e, dengê bêdeng e, destbîrakê şivan û koçberan e." Ehmedê Xanî rêya rast datîne pêşîya helbestvan û nivîskaran. Ev rêya azadiyê û heqîqetê ye. Bi ev rîstan wêjeya şoreşê jî bi me dide fehmkirin. Jixwe dema şoreş ne civakî be ew nabe şoreş. Wêje jî ger ne di xîzmeta gel de be ew nabe wêje. Wêjeya şoreşê wêjeya gel e, stran, lorik, çîrok, serpehatî, helbest, qeside û hwd. Hemû jî jî berê ve hene û hêjayî nîrxandinê ne. Di wî xali de Çerîşevskî wiha dinirxîne: "Mîletek bê wêje kor û nezane e, bi qaşî mîletek xwedî wêje be, zana û rewşenbîr e. Mirovan hîn û şad dike."

\*Zîdana Siwêregê



(...)

li çiyayê şengalê,  
komeke xenzir teyrê tawiz ji xwe re  
biraştine  
perikên wî digirin li dewsê  
tu hogirî van perikan bûyi  
hebbinarka delali  
bi cizbê ketin hêsirên te yên firyalî  
li ser goleke mêşîni

(...)

Rênas JIYAN

